# Metelokên Zaroka

**(Ji 4 parçên Kurdistanê)**



## Metelokanê

**مەتەلۆکانێ**

Komkirin û amadekirna:

**Mahir Berwarî**

**Elmanya-Dortmund-2009**

# Naverok


| **Mijar** | **Rupel** |
|---|---|
| **- Diyarî** | 5 |
| **- Pêşkêşkirin** | 7 |
| **- Destpêka pêtvî** | 9-16 |
| **- Çîroka vê pirtûkê** | 17-20 |
| **- Folklor çiye?** | 21 |
| **- Tûrê Folklorî** | 22 |
| **- Metelok** | 23-225 |
| **- Boçî Metelok ?** | 27-29 |
| **- Metelokanê** | 31 |
| **- Pulînkirna meteloka** | 33 |
| * Metelokên Giyandara | 35-43 |
| * Metelokên mirov û endamên leşî | 45-50 |
| * Metelokên bêgiyana | 59-76 |
| * Metelokên tiştumiştên navmalê û amûr | 77-81 |
| * Metelokên Jîngeh/seqa û valayi | 83-90 |
| * Metelokên bîrkarî | |
| A. Bîrkariya metelokî | 71-73 |
| B. Bîrkariya xomalî | 73-77 |
| C. Lîztin bi zilkên şixartê | 77-78 |
| * Metelokên xizmanê | 91 |
| * Metelokên rewanbêjiyê | 93 |
| * Metelokên sirtkirna ezmanî (logopädie) | 95-98 |
| * Metelokên nû afrandî | 99-101 |
| * Çend metelok bi zaravê soranî | 103-104 |
| * Çend metelok bi zaravê Zazakî | 105 |
| * Çend metelokên Elmanî | 107 |
| **- Zimanê Çizavizî** | 109 |
| **- werzên salê** | 110 |
| **- Jêderên pirtûkê** | 111-112 |

# Diyarî

Diyarî Kurdistaniyên ev gencîne di mejiyên xwe da parastin, ji hindabûnê rizgarkirin û zarokên Kurdistanê jê bê par nekirin.

Diyarî malbatên bihayê folklora xwe dizanin, rêz lê digirin,mifa jê werdigirin, zarokên xwe hîndikin, dikin xîmê avakirina kesayetiya wan.

Diyarî wan zarokên xwe pê hînî rewanbêjî, sirtiya zimanî,bîrtîjî … û pêzanînên giştî dikin, gêwilê/moralê xwe pê xweş dikin û girnijînê dixin ser sîma û lêvên xwe.

# Pêşkêşkirin

Her milletekî bi çand û kultura xwe liser piya dimîne. Kîjan milletên ku çanda xwe, kultura xwe … û zimanê xwe jibîrbike, ew milletana an ew gelana berev mirinê ye.

Mirov dikare bêje ku, ji sala 1639'an vir ve zordarîkî berbiçav liser çanda me heye, bi taybetî piştî şerê cîhanê ya yekemîn, ev zordariya liser zimanê me xwirtir bûye. Dagerkeran zimanê me qedexe kirin. Me nikaribû bi zimanê xwe binvîsînin, bixûnin, bigrîn û bikenin. Bi vî rengî/awayi gelek tişt ji zimanê me hatine jibîrkirin. Mîna `metelok, çîrok, gotinên bav û kalan, gelek sitranên kurdî uwd`.

Her çiqas Kurda li hember dagerkeran hêz dabin xwe û têkoşîn kiribin jî, lê têkoşîna me bi pirranî liser siyasî û leşkeri bûye. Bi qasî me giranî dabû ser siyasî û leşkeriyê, ewqas nedabû ser çand û kulturê. Her wiha em bi xwe jî bûne sedemê windabûna kultura xwe.

Lê di van salên dawîn de gelek rewşenbîrên me yên birêz ev xetera dîtin û giranî dan ser nivîsên çandî û hunerî. Ji van rewşenbîrên me yên pêşketî yek jî Mahir Berwarî ye. Armanca birêz Berwarî tenê Kurdîtî ye û bo çand û hunera kurd gelek xizmetê dike. Yek ji xizmetên wî jî ev pirtûka hanê ye, yanî **Pirtûka Metelokan.** Dema mirov van metelokana dixûne ji nû ve diçe salên zaroktiya xwe.

Bes metelokên pirtûkê bi angorê gelek devokan hatiye nivîsandin. Bi vê minasebetê ger hin metelok ne bi devaoka me be jî, gerek em jibîrnekin ku Kurdî zimake dewlemend e û gelek devokên wê hene.Xizmet bo Gelê me ye, serkeftin ji bo Mahir û xwendevanan!..

**M. Nureddîn Yekta** 01.07.2009-Dortmund

# Destpêka pêtvî

Xîm û bingehê vê pirtûka meteloka ji gundê Çemseyda destpêdikit. Di dema zarokatiya me da, hêj gund avabûn. Şoreşa Kurdistanê ya berdewam bû û bi xêra wê şoreşê destên dagîrkerên Kurdistanê negihabû devera me `Berwarî Balla`. Gelek dever di azadkirî bûn kontrola dagirkera li sere tunebû.

Ji ber fêl û findên şêxa, zordariya beg û axa û pîlan û dijminiya dagirkerên Kurdistanê, dûrdestiya deverê, herwisa hevrikî û şerê navbera wan û pêşmergên aza da, xwendingeh li deverê nehatbûn vekirin. Rê û rêbarên tirembêla nebûn, têkilî û hatin û çûn di navbera bajar û gundan da gelek ya kêm bû.

Van egêrên serî û gelekên dî jî, we li Kurdistaniyên van devera kirin ku reseniya kultur û zimanê xwe biparêzin. Sopas bo Xodê mezin ku em ji vê çendê bê par neman.

Baş li bîra mine, dema dayikên zarokan di landikan/ bêşîkan da zarok dihejandin û pê re sitran, çîrok, çîvanok û lorînk digotin û bi destekî teşîk dirist, bi tila pêy landik dihejand heta zarok di xew diçûn.

Hey lâyê layê
Hey layê layê Bêru dilerzînit layê
Terazî hatin moqabilî vê bêlayê
Xuzîka ji xêreka Xodê ra hakimek giran hatiba gundî xalet înaba şûna dayê.
Ezê landika delalê dilê xwe dihejînim
Ezê destan û dest bendika li sere sîngê delalî bişidînim

Ezê nizanim, ezê daykeka deybabî bo delalê dilê xwe bînim
Ezê landika delalê dilê xwe bînim li u`liyê
Ezê pêdabikim t`akukê vê puşî yê
Ezê li hûvî ya dayka landikê bim heta vegeritin ji xupannê
Ezê landika delalê xwe înim vê nav derê
Ezê li delalê dilê xwe dakim t`akê vê mêzerê
Ezê li hiwivî ya dayka landikê me heta vegeritin ji wex`erê
Landika delalê dilê min ji darê dirrî
De hostekaru malî ne ava, ber darê landika delalî kurt wê birrî
Destik û dest bendikêt delalê dilê min kurtin, nagirin sîngê vî kurrî
Landika delalê dilê min ji darê h`ebabê
Serî bi pencer e, binî bi şerabê
Inşaellah, deykêt landika nekevin ber h`aletê xirabê. (1)

Ji çîrokên gelek li dilê min dihatin dema dayka min ya rehmetî bo min digotin û ez di ber ra dixew diçûm, çîroka Durkê, Ferx û Sitî ... bûn
Ev e çend malkek ji çîroka Ferx û Sitî yê:

Ferx dibêjit:
Ya li min hatû heyvik e heyvika êk e
Xodê wa tu debarê li Ferxê ke

Ya li min hatû heyvik e heyvika duw e
Li min cebrandbûn gih û situ we

Ya li min hatû heyvike heyvika sê ye
Xodê wa dê bide Ferxê gih û pê ye

Ya li min hatû heyvik e heyvika çar e

[1] . Govara Karwan, nimre 33, sala 1985, Segvan Ebdulhekîm.

Xodê wa tu bide Ferxê gih û zar e
Ya li min hatû heyvik e heyvika pênc e
Xodê wa bide Ferxê gih û rênc e

Ya li min hatû heyvik e heyvik a şeş e
Xodê wa bide Ferxê gih û leş e

Ya li min hatû heyvik e heyvika heft e
---------------------------------------------

Ya li min hatû heyvike heyvika heşt e
Meleka li esmana peşt e peşt e
Navê Xodê çend li min xweş tê

Ya li min hatû heyvik e hevika nehîn e
Ez yê di behrek a bi xûn e
Navê min Ferx e, navê Dotmama min Sitîzîn ne

Sitî lê vedigêrit:
Herê Ferxû Ferxê malê
Ser zertir e ji serkê şemamê
Dê were hey ezîzê li ber dilê dotmamê (2)

Hêzkê nokê, ritlêt/gun Hemedokê/Hesenokê, pêkve ketne cûkê, cûka me ya kûr e, gurgî lûre lûre, gurgo tu bi Xodê key, silava li Memê key, Memê çûbû sûkê, kirîn cilêt bûkê, bûka me ya can e, ya li ser berê pan e, berek livlivî, marek di binve mirî. (3)

---

[2] . Ev çîroke gelek ya dirêj e, dayika min ya rihmetî li sala 1980bo min gutbû.
[3] . Ji zardevê dayka Evînê û Bedîa`a yê hate wergirtin. Kêmatî yên tê da heyn.

Gelek cara bû henek û girnijîna zaroka gilîzank û qilîqidank (4) ên wan vedikirin. Ev henek û yarî di rê ya hindek gotinên sivik û lêkînay bi rengê helbestkî bi zaroka ra dikirin bo mînak:

- Iklî diklî dunazer, sebab rebab duqazer, kewê sîrê yê li bin bîrê, qilîç, babelîç, şkevik, lolîdemk, spihkujk uwd.
- Lolî lolî dembî, keşk û rûn û pembî, bo roja êkşembî, qilîç, babelîç uwd.
- Heleven du leven, çarî çimbil, biskên umbil, tasê tûsê, mamhulîsê puza fella , ....... hilpeqlîçê, melay gut: Ellahu ekber.
- Çoçe zer e garis xwere, kurtekê sor û zer e, bo (   ) ê bîne û were.
- Êkan e du pişkan e

Xana çepê, çeplemizê, are gizê
Tute hînê, şekire şirînê
Kope çînê, hilkişîne. (5)

- Şûşê tu bi Xodê key
Silava li Memê key
Memê çûbû sûkê
Kirîn cilêt bûkê
Bûka me tirxan e
Li sere berekê pan e
Berê pan kelişţî
Şêrê di nav da kuşţî (5)



Çûkê çûkê, nukul nûkê
Pîj nenûkê, li nav sûkê
Banke li bûkê
Bûkê bîne, nav hêlîne

---

4 . Gilîzank û qilîzank: Til bi binê piyên zaroka û bin çeng anîn û birin.
5 . Ji zardevê meta min Eyşa Sidîq di 14.08.1980 hatiye wergirtin.

Bixemlîne, bên gulîne
Zava can e, şev dîlan e! (6)

Paşî ku zarok hinek fama dibûn, li hev komdibûn, dixwestin hevdu biceribînin/testkin ka çend zanane, bîrtîj in, tişta nasdikin û ezman sirt in/rewan in. Testa wan ya zîrekî û jîriyê, bersivdana meteloka bû.

Piraniya caran malbata bi şev zarok komdikirin û metelok bo digotin, zaroka jî li dûv bîrtijî û şehrezayi ya xwe bersiv didan, li vir zarokên bîr tîj, sirt, fehma, zana û rehwan diyardibûn.
Herwisan gelek caran zaroka bi xwe jî xwe test dikirin. Dema gêwilê/zewq a êkî lêdaba da gazîkit:
``Metelok matelok, avê dikem e mencelok, heta dibeme Dohuk.``
Dema Zarokên dî dibihîst, wan dizanî dema metelokane, li hev komdibûn û metelok dihavêtine ber êk û bersiva wan didan.
Gelek cara jî bo sirtkirna/xwirtkirna ezmanî, henek û şermezarkirna hevdu, bi hindek rêzkên rewanbêjî rewaniya zimanê hevdu test dikirin. (7)

Em zarok gelek cara di mal da kesîre, bê gêwil, deqisî ... dimayin, me dixwest ku xwe mijûl keyn û serê malbatê jî rehetkeyn, em diçûyne dervey xaniya, di nav gund da an jî ji derve. Zarok komdibûn û dest bi henek, tirane û yariya dikirin.
Yariyên zaroka dikirin gelek cûr bûn, li dûv heza xwe dihilbijartin.
Evên xwarê hindekin ji wan yariya:

---

[6] . Ji amadekirina Farqîn Melek Aykuç e.
[7]. Binêrine beşê rewanbêjîyê.

``Matanê, tebelanê, kabanê, çûkanê/veşartkanê, tirranê, birranê, gultanê, damanê, pêncukanê, tûsanê, çûlanê, guwanê, îşqilkanê, çîxnanê/gilçane, kerqebyanê, qereqasanê, morkanê uwd ``

Zarok di bê par nebûn ji keyf û lezeta karên bi kom mîna: `` Maziçinîn, dirûna birincî, garisî, genimî/dexlî, ada birincî``. Di ber van karên zibarkî/herweyi ra gelek henek, yarî, axaftinên lêkday, tirrane, suhbetên xweş ... dihatin kirin. Herwisa çirok, çîvanok, metelok, heyranok, sitran ... digotin û demekê xiweş dibirneser.

Li payizê dema savar qutan dihat. her malbatekê li gorî pêtviya xwe genimê birincî/rind amade dikir. Bi roj dikire di mencelên mezin da û dikeland heta dibûne danîk. Piştî hişkbûnê komdikirin û dixistin di nav tûra da û di şevekê da gundî daxazdikrne şeva savar qutanê, mezin û zarok lê kom dibûn, zelama bi mîrquta lê dixistin heta tûkê/tîvil danîkê di serda diçû. (8)
Paşî demekî da bite gerra/dora savar hêranê. Jin kom dibûn di malekê da, distara da amade ken û bi hevra danîk li distara dikirin û dihêran.
Li demê savar qutan û şeveroka da gelek pêkenok, suhbetên xweş, sitranên girêday savar qutan û hêranê/şeverok dihên gotin.

Rojekê ji roja em zarok bi hevra, qol qol/grob mal bi mal li gund digeriyan. Her êkî ji me tûrkek di destî da bû, me li dergihê mala dixist û daxwaza diyari ya ji malbata dikirin. Me bi hevra digot:
- Serê salê binê salê, Xodê kurkekî bidete malxuwê malê.
(Heke malbat ya bê zarok /kurr ba.)

---

[8] . Bo bêtir pêzanîna li ser vê mijarê bikevne di malperê www.mnyekta.com/ coni û dan

- Serî sûke, binî sûke, Xodê kiça we bikete bûke.
  (Heke malbatê kiçeka li şûya heba.)
- Malî ava malî ava, Xodê kurê we bikete zava.
  (Heke malbatê kurekê bê jin heba.)

Her malbatê bi gorey hebûna xwe diyarî didane me (9) û em dilgiran û destvale ne dişandîn.

Li demê bûk guhaztinê da jina bi hevra narink digotin, çend jinên deng xwoş bihev ra digotin qolekê dî lê vedigêran û teva bi hev ra tilîlî vedidan. Mêra serkê zavay bi du qolî digot û sitran bêja diwan dişarand.

Tiştê herî balkêş bo me zaroka‹ çûna bêriyê bû. Nîvroja pez dihate mexelê/bêryê, em li gel bêrîvana diçûne bêriyê. Bêrîvana şîr didoşt, em zarok li dor menceloka dizivrîn û me bi belgêt çilo kefa ser şîrî dixwar. Bêrîvan vedigerane mal, ew şîr dikire mast paşê dikirne meşka û dikiyan, da nîvişk û dewî jê vegirin. Jina di ber meşkê kiyanê ra sitranên balkêş, xweş û girêday rêçalî digotin.
Eve parçek ji wan sitrana:

Hay meşkînê meşkînê hay meşkê
Hay meşkînê meşkînê hay meşkê
Dur û lewleb zêrînê hay jarê
Ya li ber meşkê xatûnê hay meşkê
Ya li ver meşkê xatûnê hay jarê

Evê meşkê çi derd e hay meşkê
Evê giyanê çi derd e hay jarê
Kabanî ya zig ferde hay meşkê
Kabanî ya zig ferde hay jarê

---

[9] . Diyariyên wî demî tiştên xomalî bûn mîna: giwîz, bahîv, mêwîj, qesp uwd.

Tu avê di malê werde hay meşkê
Tu avê di malê werde hay jarê (10)

Zarok sinêl e dibûn, li bêriyê, şeveroka, mazî çinînê, zibara, dirûnê, adê … tevlî hev dibûn, dilên wan geş dibûn, di evînî yê werdibûn. Ev hez û viyana Xodayi ya rast û dirist roj bi roj li cem evîndara mezin dibû û diaqidî. Vejena vê dibûne pêgotin, derbirîna hesta xwe bi rengê heyranoka derdixistin. Ji dilên sutî peyvên nazik bi selîqe divehandin û bo hevdu digotin.
Ev e Minakeka heyranokane:
Kiç dibêjit:
Kurko dîno;
- Ez a bilind im, ya kurt nabim
  Zêrê zer im xirab nabim
  Ez ya te me lê venabim.
- Dê çîne zozana pêkve pêkve
  Dê keproka çêkeyn şeqle bi ser êk ve
  Dê heft nîvekêt şevê xwe kêşîn bi ver êk ve.
- Li ser bana meş meş neke
  Agirê cigarê li min xweş neke
  Ez ya te me xwe şaş neke.
  Kur dibêjit:
  Kiçkê dînê;
- Dê bila bila
  Here nav hewdê bişkêne gula
  Ditina ser bana tenahiya dila
- Bejna bilind li ber gotinê
  Li ber kirrîn û firotinê
  Ez dê lêdem rihka şirîn  malê dinê. (11)

[10] . Govara Karwan, nimre 84, sala 1990, Cemîl Mih`emed Şêlazî.
[11] . Govara Karwan, hijmara54, sala 1987, Rêjenê Binavî.

## Çîroka vê pirtûkê

Wekî min di mijara `**Destpêka pêtvî**` da ronikirî, min zaroktiya xwe li gund qetand, ez di nav civakeka sade, bijûn/paqij da mezin bûm. Min pirr ji folklora Kurdî hezdikir, ez di nav da mezin bûm û zûr mifa min jê wergirt. Min gelek hez ji metelokên Kurdî kir, metelok bûne parçek ji jiyana min. Li demê sinêliyê da, hizra komkirna folklora Kurdî taybet meteloka kete serê min.

Min di sala 1980ê da dest bi nivîsîn û komkirna meteloka kir, min ji xwe destpêkir, ewên min dizanîn min nivîsîn. paşê li havînê ez diçûme gundên derdorên gundê me mîna: Bazê, Kanîmezinê, Xişxaşa, Bêşîlê, Asihê, Babîrê ... Min karî gelek meteloka vecemînim.

Paşê demekî ez karîm gelek metelokên deverên derdora Zaxo, Dohuk, Amêdî, Akrê, ... vecemînim. Min ev hemî meteloke serad û bêjîng kirin, rêkxistin û polînkirin. Min ji van meteloka pirtûkeka destnivîs amadekir. (12)

Di sala 1985'an da, hevalê min yê rihmetî Pêzanê Alîxanî pirtûka pir hêja``**Du mirwarî ji folklorê Kurdî**``çapkir, ez pirr pê şad bûm û xewna min hate cih. Min dest ji komkirna meteloka berda çimkî pirraniya metelokên devera Behdîna hatine çapkirin.

Min Di sala 2007 ê da li Elmanya, kit kite metelokên Kurdî di malperên Kurdên Bakûr û Rojava da dîtin, lê

[12] . Mixabin ev pirtûka destnivês li Enfalê sala 1988 di mala me da li gel gelek nivêsên min yên dî bi destên reşên leşkerê Seddamî û çetên xwe firoş hatine sûtin û runahî nedîtin.

gelek bi kêmayi. Ez li erşîfa xwe vegeram, min gelek metelok vedîtin ewên min komkirîn, lê hemî nebûn.

Min bi fer dît ez dîsa dest bi komkirina meteloka bikemve, lê vê carê yên herçar parçên Kurdistanê. Ez keftime dûv malperên Kurdên Bakûr û Rojavayê Kurdistanê, min gelek komkirin lê piraniya wan dubare bûn di malpera da. Min ji zardevê gelek Kurda jî metelok vecemandin.

Min dixwest ku metelokên Kurdî yên her çar parçên Kurdistanê û bi hemî zarava komkim, lê dema min dîtîn ku dê bine gelek û ji şiyanên min mezintirin, min bi fer zanî bi tenê metelokên bi Kurmancî di vê pirtûkê da belavkim ji ber çend egera:
Min xwest vê pirtûkê bi tîpên latînî û ji bo Kurdên Bakûr û Rojavayê Kurdistanê çapbikem, lewra min xwe ji metelokên soranî dûr xist (13) çimkî Kurdên Bakûr û Rojavayê Kurdistanê tênagehin.
Dem û şiyanên min yên diravî rêgir bûn li ber mezinkirna pirtûkê.
Miraz ji vê pirtûkê ne vekulîne li sere meteloka bi rengekê ekadîmî, belkî komkirina metelokane û aşnakirna zarokên Kurda (14) bi metelokên Kurdî, herwisa parastina meteloka ji hindabûnê.
Min wisa dana bû ku beramberî her metelokêkê navê jêderî danim wek emanet û mafên wan jêder û berêzên metelok jê hatine wergirtin, lê dema ez keftime di nav karî da min dît ku karek giran e û ji layê teknîkî ve destnadet, lew ezê bi tinê li dawiya pirtûkê bideme naskirin.

---

[13] . Bi hizara metelokên Kurdî bi zaravê soranî ketine destê min, ji bu tevlihevî çênebe ezê kit kite wek mînak li cihên pêtvî di pirtûkê da belavkim.

[14] . Miraz jê pirtir Kurdên dervey welatin bi giştî û taybetî kurmanc.

Giraniya pirtûkê li ser metelokaye, lê min bi fer dît ku hinek tiştên fer û girêday meteloka li gel bi kurtî belavbikim, mîna mijarên `rewaniya zimanî, bîrkarî, zimanê çizavizî uwd.
Min nexwest ez destkariyê di çi meteloka da bikim, çawan min wergirtine bi çî devok wisan dê weşînim. Gelek li hevçûn, dubare û têdîtin/têbînî têda min vedîtin lê min delîvê vewjartin, rastvekirin û serastkirna wan nebû, lew dê vî erkê hêja û giran hêlîn bo pispor û şehrezayên vî biyavî.

Li gorî şiyanên xwe min xwest ku meteloka li dûv van mijara ``metelokên girêday candara, bê cana, mirov û endamên leşê mirovî, av û hewa/jîngeh, metelokên nû afrandî/ne folklorî uwd`` polîn kim da bo zarok û xandevana bi sanahî bit û zehmetê vêra neben.

**Min gelek mereq bû ku ez vê pirtûkê bi zaravekî wisan binvîsim ku piraniya Kurdistaniya jê fêm bikin û nêzîkî zimanê standardê Kurdî bibin, lê mixabin ez di nav devok û zarava da heyrî/mat mam, min nexwest tevlîheviyekê bikim lew ez mecbûr mam ku bi devoka Behdînî binvîsim. Paşî bi alîkariya birêz M.Nûreddî Yekta destkarî têda hate kirin, nêzî devoka bakurê Kurdistanê hatkirin. Herwisa alîkariya serastkirina rênivîsa pirtûkê jî kir.** (15)
**Daxaza lêbûrînê ji xandevana dikim eger kêmasî têda hebin.**

Min bi fer zanî di beşekê vê pirtûkê da wan metelokên bi xwedî, anku ewên nivîsevana afrandîn û ne folklor in belavkim, ji ber ku da Kurdistanî bizanin ku kesa dest

[15] . Ji bu zengînkirna pirtûkê, li dûv daxaza min çend peyvên naskirî yên devoka joriya welatî têkirin.

daye nivîsîna meteloka û dê di pêşerojê da hêj bên nivîsandin. Mixabin gelek kes tevlî hev dikin yên bi xwedî û yên bê xwedî/folkolur dikin qalibekî. Hivîdar im ji nivîsevanên meteloka vê dîqet bikin, metelokên bi xwedî navê xwedî li ber deynin. (16)



* Jêderê wêney `Google` ye



**Mahir Berwarî**
**Dortmund/Elmanya**
**barwari@web.de**
**05.07.2009**

[16] . Di pirtûka `Tiştonek1- Emîn Akbaş` da min ev şaşiye vedît, tiştonekên bi xwe afrandîn bê nav têkelî yên folklorî kirbûn.

## Folklor çiye?

Folklor peyveka lêkdaye/lêkdiraw ji du birga (Volk-lore) pêktê, bi wata/mana koltorê gela/kelepurê mileta. (17)
Ev e peyveka Latiniye, Li Ewropa tê bikaranîn, taybet ji alê Elman, Ingilîz, Yonanî ... a ve.

Şûnwarnasê Ingilîz Sîr Wilyem Cun Tomas bo cara êkê zaravê folklor bo mijarên kelepûr di sala 1846 ê da bikaraniye, herwisa bizava zanayên Elman Wilyem Girîm-1877 û Yakub girîm- 1775-1863 bi destpêka lêkolînên zanistiyên li ser folklor tên nasîn. (18)
Meksîm Gurgî dibêjit: Xîmê tûrey/edebiyat folklore. Ev gotin e giringiya folklor derdixit, kesên afrandin kirîn berhemê xwe li ser xîmê folklor avakirne û mifa jê wergirtine.

Folklor ji du beşa pêktê:
- Koltorê zargotin : van beşa bi xwe ve digrit ``Metelên mezina (pendî pêşînan), pêkenîn, metelok (metel/ tiştonek-mamik), helbest, sitran, heyranok, pêgotin, çîrok, dastan, efsane uwd. ``
- Etnugirafî : Tiştên madiyên ne zardevin/hunerên milli mîna: ``Şayi, dawet, nexş, dirama û tîtalên civakî`` mîna: ``Cankariya jina, jin xwestin, bûk guhaztin, veşartina miriya, xarnên kevin, karên destî Mîna : kûn, kurtan û zîn, tevin, berr, mahfûr, gurî, ristina cilka, distar hêran, gêre, savar qutan, ripse uwd ``

[17]. Li Wikipedia binêre.
[18] . Berkotêkî metelî folklorî Kurdî-Sedredîn Noredîn- Hewlêr/2005.

# Tûrê Folklorî

Tûrê folklorî beşên zargotinê vedigirit, berhemekê bê nav û xwediye, kesên ku afrandine nediyarin.
Ev berheme ji ziman bo zimanî, kes bo kesî veguhaztine, xomaliya/oricnala wan nemaye, guhurrîn bi serda hatiye, li deverekê bo devereka dî cudayi di navberê da tê dîtin, lê hêj di qalibê xwe da mane. Ev tûre ji ber bê xwediya xwe bûn milkê giştî û li ser navê civakî tê hijmartin.

Folklor rengvedana dîrok, têgihan, rewş, sinc/tîtal, rûdan, xweşî, nexweşî û qunaxên domkirna gelaye.
Ger bixazî gelek nasbikî, li folklorê wî vekole û şarezabe, Ji ber vê çendê pûtedan bi folklorî taybet bo Kurda pirr giring û fer e, çimkî Kurd bê xwedî mane, kesên ne şareza, biyanî û dagirkerên Kurdistanê dîrok, sinc, … li gor zanîn û berjewendiyên xwe nivisîne, gelek ji wan dûrin ji rastiyê.

Fer e Kurd şanaziyê bi folklorê xwe bikin û xwedî lê derkevin, çimkî ev folklor e gencîn e û erşîfekê pirr bi bihaye, Kurd dikarin jibo serastkirina dîrokê, paqijkirna zimanî û guncandin li gel nûkirnê mifa jê wergirin.

# Metelok ([19])

Metelok beşekî herî giring e ji folklorê, girêday torê zaroka ye. Metelok çend peyvên sivik û lêkday ne, pêkve tên girêdan, vehandin û darêjtin, di qalibê helbest/helbesta kilasîk an pexşanê da, hevokên bi seruber, lêkday, kurt, nazik, xwedî selîqe/awaz û bi qafiye ye uwd.

Metelok kesa afrandine lê xwediyên wan nayên naskirin, berze û hindabûne, lew dikevine di xana folklorê da. Lê li van salên dawî da, meteloka rewac kiriye û Kurdan pûte/giringî pêdaye, gelek ji wan çapkirîne û ji hindabûnê qurtalkirine. Herwisa gelek nivîsevana dest bi afrandina meteloka kiriye û kitomata di govar, rojname û malperên Kurdî da (20) belavdikin.

Miraz ji vegotin û afrandina meteloka/mifayê meteloka:
Bûrîna demî, mijûlkirna zaroka û rehtiya tenahî malbata.
Xortkina têkelî, lihev nêzîkkirna zaroka, qebûlkirina hevdu û gêngeşekirin/danustandin.
Xwirtkirin, zîxkirin, xulxulandin/livandin û firehkirna biyavê mejiyê zaroka.

---

[19]. Ev e Kurd hene metelok her hebûn, lê kes nikare bizane kurda çend metelok hene, ji ber ku pirraniya wan nehatine erşîfkirin û hindabûne. Nivîsevanê biyavê folklorî Hecî Cei`fer, metelokên devera Behdîna dihijmêrit û dikete 539 metelok. Navbirî di wê bawerê daye ku metelokên Kurdî bi tevayi nagihne 700 meteloka, lê ev e gelek ji rastiyê dûre (Karwan-nimre 51- sala 1986). Metelokên di vê pirtûkê da çapbûne zêdetirin ji 750 meteloka û bi hizara jî di pirtûka (Berkutêkî metelî folklorî Kurdî-Sedredîn Noredîn-Hewlêr-sala 2005) û yên dî da hene.
Ez bi bawerim ku her tiştekî, kiryarekê ... li sere Donyayê metelokek yan çend metelok bo hene.

[20] . Binêre beşê metelokên bi xwedî û nû afrandî.

Pirtir kirna pêzanînên zaroka bi rêka meteloka, haydarkirin ji tiştên girêday jiyana wan.
Peydakirna gêwilê hizirkirnê û nêrînê di tiştên li derdura û girêday jiyana wan ya rojane ye.
Testkirina astê bîrtîjî û pêzanînên zaroka ji alê malbatê ve. Malbat dikarin bizanin ka zarokên wan bi nêzîkî çend di zîrek, hişyar, xwedî pêzanîn û fehma ne.

Metelok gelek giring in bo sirtkirin û rewaniya zimanê zaroka taybet ew hevokên dikevine qalibê rewanbêjiyê da. Ev beşe li dervey welat, taybet li Ewropa pûtekê zûr pê didin û dibêjnê Logopädie. Min bihîstiye ku kursên taybet bi vê mijarê ve didene rojnamevan, bêjer, peymanêr û pêşkeşkarên bernameyên Tv û Radiyo ya.

Metelok li gur jiyê mirova hatîne afirandin, melelok hene ji serve serve, sanahî û raman belîne. Pirraniya vî rengê meteloka ji bo zarokên biçûk tên gotin, lê gelek metelok hene aloz in, giran in û veşartîne, bîrtîjî bo divêt, bo zarokên baliq û sinêle tên gotin.

Pirraniya meteloka girêday tiştumiştên derdûra zaroka û girêday werara jiyana wan e. Di destpêkê da tiştên berceste/madî rola xwe dibînin, hêdî hêdî bi werara mejî û bîrkirnê biyavê manewî dihête meydanê.
Metelokên madî pesinên/saloxe serve serve û berçavên tiştên candar/livok bo mînak ``dewar, kêvrîşk, sivore, masî, mar, pêşî uwd `` û mirî mîna ``distar, aş, kezan, gihûşk, tenûr, bivir, hêk uwd `` yên derdûrên biyavê zarok têda dijîn. Miraz ji metelokên neberceste/manewî ew in yên girêday tiştên ne madî mîna ``sîber, ewir, sal, ba, deng, mirin, bîrîsî/brûsk uwd.``

Metelok pesna tiştekî berceste yan ne berceste yan haletekî bi nêzîkî dikin, hinek ji  nîşan û sexletên wî/wê mîna `` kiryar, livîn, başî, xirabî, cih, dem, reng, tam uwd `` diyardikin bi rengekî nepenî û veşartî, ev pesine dihên gugirandin û lêkînan bi çend peyvên nazik, sivik û xomalî di qalibê helbestê an pexşanê da. (21)

---

[21] . Piraniya meteloka bi helbestkî afrandine, lê bi bûrîna demî û dev bo devî/zargutin gelek ji qalibê xwe yê helbestkî qetane, beşek ji qafî û selîqa xwehindakirîne, di encamê zargutin û hizarbarekirnê da nêzîkî pexsanê bûne.

## Boçî Metelok ?

Çi gel bê folklor nînin û çi folklorên gelan jî bê metelok nabin. Her gelekî çend navên cuda cuda bo (beramberî) peyva metelok hene bo mînak:
Ingilîz: Puzzle, Enigma, Mystery, Riddle, Scer…
Elman : Puzzle, Säge, Sinnspruch, Spirichtword, Rätzel..
Tirk: Mesele, Bilmece…
Ereb: لغز، معما، حزورة، الاحجية، العويص
- Kurdi/ Kurmancî: Metelok, mamkê mino/mami), malîkî mino /malîkanê, tiştîkê mino tişto/tiştonek-tiştî, têderxistok, ….
- Kurdi/ Soranî: Metell, hetelle, meyl, hellêne, çewçe…(22) Jiber zengîniya zimanê Kurdî û pirriya zarava … gelek peyv hene bi mana nêzîkî peyva metelokê.

Ez li vir nabêjim seda sed ka kîjan rast e, nerast e an nêzîkî rastiyê ne, ev serastkirin xema zana û pisporên vî biyavî ne, ez bi bawer im di pêşerojê da wê bêne serastkirin. Li gor zanîna xwe di vî biyavî da, ez wisa têdigihim ku peyva ``Metelok`` seda sed bikêrtêt û ligel diguncit, ji ber van eger û şirûvên li jêr.

- Di zimanê Kurdî da, gelek cara, paşkoya (ok) bi nav ve biçûk kirna wî naviye mîna: ``Mencel-mencelok, Ehmed-Ehmedok uwd `` Li devera Behdîna peyva metel bo metelên mezina (pendî pêşînan) têt bikaranîn û metelok bo metelên zaroka têt bikaranîn. Bi hizra min metelok peyva herî binecih û rast e.

[22] . Berkutêkî metelî folklorî Kurdî-Sedredîn Noredîn-Hewlêr-sala 2005-bp33.

Ji bo piştraskirin û rastiya vê buçûna min li vê malka helbesta helbestvanê mezinê Kurd ``Ehmedê Moxlis) binêrin ka çawa metel/mesel li şûna metelên mezina/pendî pêşînan aniye û metelok li şûna metelên zaroka aniye.
Ez çi bêjim çî beyankim metelok û mesela?
Şûl ew e ya te kirî hîn û dema qal û bela
Ev îlham e te day min ne bo red û cedela
Bi yeqîn cenetiyê wahidê henanî ez im (23)

Herwisa pirofisûr û pispûrên kultura Kurdî Urdixan û Celîlê Celîlî peyvên mesel/metel û metelok wekî Ehmedê Moxlis bikaranîne. Binêrin navê pirtûka wan:
Mesele(مثل) û metelokên Kurdî-Urdîxan û Celîlê Celîl-1972. (24)

- Gelek cara di destpêka gelek meteloka da çend peyv dihên bikaranîn mîna: `malîkî mino, mamkê mino, tiştîkê mino tişto…`, kurtkirna wan bûne şûngir/cihgir bo navên meteloka mîna: ``mamik, malîk, tiştonek…``
Bi hizra min eva cihê meteloka seda sed nagirin.

- Di zaravê soranî da, peyva metel beramberî peyva metelok /metelên zaroka bikaraniye û peyva pendî pêşînan beramberî peyva metel (metelên mezina) bikaraniye, bi hizra min ne gelek di cihê xwe da ye.

---

[23] . Dîwana (Baxê Kurda – Ehmedê Nalbend- Dohuk-1997-berperê 287) Ehmedê Moxlis li sala 1891-1892 li gundê Bamernê, li başûrê Kurdistanê ji dayk dibit û li sala 1963 li gundê Xişxaşa li devera Berwarî ya xwe dikujit. Moxlis helbestvanekê berketî bû, jîna xwe kire gurî turê Kurdî, heta niha pênc dîwanên helbestê hene li bin navê ``Baxê Kurda`` çapbûne

[24] . Peyva tiştonek li Bakûr û Rojavayê Kurdistanê bo meteloka dihêt gutin, li gor baweriya min, egera wê jî vedigerit bo hindê çimkî meteloka girêdaneka mukom bi tiştumiştên durên mirovî ve hene û li ser wan hatine vehandin.

Helbestvanê navdar `Piremêrd` mifa ji meteloka wergirtiye, têkelî helbstên xwe kiriye û helbesta xwe pê bihêzkiriye.
Binêre vê meteloka `` Em lay dîwar ew lay dîwar, nawerastekey segêkî har. (* dev û ezman)``. çawa bi şarezayi hizra wê xistiye qalibê helbesta xwe û nûkirin têda kiriye.

Xowa xoy ezanê ziban nawestê
Hênay hepsîkird hawêşte bestê
Le pûk û le dan kirdiye du dîwar
Du lêw be serya dîwar bû be çiwar
Bem çiwar dîware hêşta bend nabê
Ebê lewewe gerduş berpabê
Metelî Kurdî bo rêkxirawe
Be gurgêkî har nawî birawe
Em lay dîwarew ew laşî dîwar
H`episxaneye bo gurgêkî har
Legel ewîsa eger derfet bê
Nayelê serî xêwî reh`etbê
Xo eger bête ser barî çake
Le hemû uzwî bende da take (25)

[25] . Berkutêkî metelî folklorî Kurdî-Sedredîn Noredîn-Hewlêr-sala 2005-bp37.

# Metelokanê

(Gotin û bikaranîna meteloka)

Li demê zivistan û bêkariyê, bi şev û êvariya, di rojên vala, şeverok, savarqutan û şahiya da …. li gunda gotin û bikaranîna meteloka ya mişe/pirr bû.
Cara zarok bi xwe li gel hev, cara jî malbat digel zarokên xwe bo henek, kenî, borîna demî, pîvana astê zanîn û bîrtîjiya zaroka, zêdekirna pêzanîna metelokanê dikirin.

Dema zaroka dem û gêwilê metelokanê heba, da xwe kene qol qol/kom, ji her qolekê da yek destpêkit meteloka xwe bêjit û da mînîne li benda bersiva qola dî, paşê da bite gerra qola dî. Her qolek da bersivên xwe yên rast hijmêrin, li dawiyê da diyarbit ka kijan qolê ev berikane/hevrikî biriye. Carna jî malbata metelokanê bi zarokên xwe ra dikirin.

Gelek caran zarok di nav metelokanê da, hevrikiya sirtî û rewaniya zimanî dikin, ew zarokên ezman fis û sist diyardibin, gelek caran zarokên pê dikenin, sixirka wan dibin, ev çende ji alê saykolojî ve pirr xirab e û karekî nerênî dikite ser wan zaroka. Zarokên şermin, veciniqî, bê bawer … jê peydadibin.

## Pulînkirina/rêzkirin meteloka

Metelok biyavekê fireh û cuda cuda digirin, girêday gelek mijar û tiştan e, li ser her tiştê li derdûr û girêday mirova hatine afirandin, lew polînkirna wan karekî giran e.

Min bizavkir ku van hemî metelokên cuda cuda li gor mijar, mana û girêdana wan bi hev ra di çend beşa da polîn/rêzbend bikim ku vedîtina wan ji zarok û xwendevana ra sanahî bibit.

Metelokên di vê pirtûkê da li ser van beşa belav û polîn bûne:
- Giyandara/candara
- Mirov û endamên leşî
- Bêgiyana/necandara (darubar, keskatî û qût)
- Tiştumiştên navmalê û amûr
- Jîngeh/seqa û valayi
- Bîrkarî: Eve jî dibine çend beşek mîna:
  Birkarî bi rengê melteloka
  Bîrkariya xomalî/xweser
  Lîztin bi zilkên şixartê
- Metelokên xizmanê
- Rewanbêjî
- Sirtkirna zimanî (logopädie)
- Zimanê çizavizî
- Werzên salê
- Metelokên nû afirandî
- Çend metelokên Soranî
- Çend metelokên Zazakî
- Çend metelokên Elmanî

## *Metelokên Giyandara/candara* (26)


Ev metelokana girêday giyandarên avî û dêmin, mîna ``hirç, mêrî, masî, kew, mar,…..``. bi pesin û saloxetên wan di nav metelokê da, mirov dikarit nasbikit.



**1. Sivore**

- Ji vî banî, bo vî banî, bo pêziçka Şeytanî.
- Ji vêrê heta Balete, hemî Cihûyêt kurete.

**2. Kêvrîşk**



- Helvandira, helwandira, dihavêt lotik û qendira, şaxêt bizina, guhêt kera.
- Her li van dera, her li wan dera, tiştek derket ji nav bera, pêt gurga, guhêt kara. Helo dera, helo dera, şûn pêt sa, guhêt kara.
- Sergelgele bin gelgele cav zîqa simbêl bele.
  Ser gelgelu, bin gelgelu, çav zîq û simbêl belu.
  Ser gile bin gile cav boq û simbêl bele.
- Pê puka, guh belok.
- Çî li deştê bit çi li nav bera, çi li ber qurmên dar û bara, pên gurgane, guhên ker a.

* Reşîd Sindî: çu di kunê ve ne mare, pûrtê pêve ne kare…(Kêvrîşke)
* Gelgele: Belg û qirşê pawîzê ye. Bel:Veday, xar.



**3. Tebu**/ nuj (qirnî)


- Mûtê bê pûte, dixot û narrîte.

---

26 . Metelokên binecih xîçek li ber hatiye danan. Metelokên kêm cudayi têda tên veditin li bin hatine rêzkirin.
* Ew nivisînên stêr li ber têbînî ne.
* Destkarî di devoka metelokan da nehate kirin.

**4. Jûjî**


- Çume rêkekê, mamê mişt ji wêve tê, piştiyê li nîva piştê, min gutê: Mamo dê kîve çî? Gut: Dê çime Biheştê. Êk dihat ji deştê, milekê sitirî ya li piştê, min gut mam dê çi key? Gut dê çime Beheştê.
- Feqîrek têtu ji deştê, piştiyekê sitiriya li piştê. Kalo tê ji deştê, barê stiriyan li piştê.
- Tiştekê min heye, can goşt û hestîne, kincê wî bi derzîne.
-Tiştek min heye teqteq dike ne dare, serê mişke ne mare, giya dixwe ne kare. (* Kusî ji dibe)
- Kumê gup û bi dirî.
- Hebanoka bi derzî, mar ji ber dibezî.



- Mamekê min li deştê, barekê sitirî ya li piştê, dikit nakit, destê wî na gihite piştê.
- Hulik mulik, mamê te yê difin gulik.

**5. Kîsel**/kusî

- Çolî/giyay dixot ne kar e, ser mişk e qon mar e, ne mişk e ne mar e.



- Hêr hêrî ye, ne mar e, çulî xûre ne kar e.
- Ji hêrve mil, ji wêrve mil, yê di navda mîr kurvil.
- Vî alî text, ji wî alî text, jê derket kalekî bêbext.
- Tiştek heye tiştanok, li ber kevir xiştanok.
- Ser textik e, bin textik e, giya dixwe ne karik e.
- Çerm û çîqal e mû nîne, çar dest û pê ne, dûv lê ne.
- Tiştek heye ser text e, bin text e, di nîvê de pîrek e bêbexte.
- Ji vî alî dar, li wî alî dar, di navberê da, goştê jar.
- Kutan dikî ne dare, serî mişk e, ne mar e, di çêre ne ker e.
- Tishtekî min heye, teq teq dike, ne dar e, serî mişk e, ne mar e, gîha diwxe, ne kar e. (*Jûjî jî dibe)
- Ji binve dar, ji serve dar, çolî/giyay dixot ne mişk e ne


mar.
- Diçerit kar nine, dizelit mar nine, hêka dikit mirîşk nine.
- Ji serve dep e ne dar e, ji bin ve dee ne dar e, giyay dixut ne kar e, diçite di kunê ve ne mar e.

**6. Dûpişk**
- Lawkê Deştanî, çû serê banî, qun tîjtir e ji didanî.
- Lawk ê Elman a, digerit li ser bana, qun tîjtire ji didan a.
  Lawkê Elman a, bi şevê digerhit li ser ban a, qun tîjtire ji didan a.



- Mamkê min berekat, terkek li te da, qarrên ji te hat.
- Çeq e leq e/meqe, heçî yê destê xwe bidê ehmeq e.
  Çeqmaq e, çeq û leq e, yê destê xwe biketê, yê eh`maq e.
- Ez çûme ser banekî, qûn kefte ser ranekî, 7 dûng bi beranekî. * bê manaye!

**7. Mar**



- Teyrek firî şîvekê, perr pêve ne, qun li nîvekê.
- Şiva terr, li guher.
- Şiva ter e, li bin axê.
- Singê xar e, li bin dîwar e.
- Zil e wekî zîwan nexişandiye wek tîman, ne dîne û ne îman, yarê hemî rihan.
  (* corekê têrra hebû di gotinê tîman)
- Tiştek heye tiştinok, li nav kevir e xiştinok, ne ber heye ne piştok
- Tizbiya kalê, berê xwe da palê. (* meinayê nade!)

**8. Mişk**



- Apê sincik bazda quncik
- Helhelîko melmelîko, simbêl tîjo guh belîko.
- Gasim e, dîwar sime.


Qasimî, dîwar simî. (* mişk, mêrî, darkoke)

**9. Pişîk**/kitik



- Fatka melê, têtu ji kelê, rih pêvene, simbê belê.
- Helhela simbêl bela, wê digerhit li ser lêvêt kutela. (* dibit giyandarekê dî bit!!)

**10. Masî**



- Temteme, qulinteme, sîngê şêra, çavêt mara, pîr Ecem e dirrinde me.
- Tiştekê mino tiştanî, li ser textê sultanî, pêxémberî şûrê xwe di stû danî.
- Di avê de pêlewan e, li bejayiyê/dêmî bê can e.

**11. Darkoke**



- Himhime dîwar sime.
(* bo dumanê jî tê bikaranîn)
- Himhime, darî bisime.
- Hindî min li bîr e, Mihemed axa wezîr e, li nav teyra, êkê bi şîr e.

**12. Dîki**l/Dîk




- Tiştek min heye ser mişar, nîkil mikar.
- Şaşik li ser seraye, bang dide, lê ne melaye.
- Sere mişaru, pê xeparu.
(Es kam ein Mann aus Ägypten, sein Rock war aus taosend Stücken. Hat ein knöchern Angesicht, hat einen Kamm und kämmt sich nicht./Elmany) (27)



**13. Kew**
- Ji vêrê heta Mûsil hemî lawkên çav bi kil.

---
[27] . Das große Buch der Kinderreime. Janosch- 2004 Germany.

- Ji vêrê heta Mûsil, hemî xatûnên çav bi kil.
- Stû rahêl bi bendala ra di bezit.
- Wit wit, şûnkê dûl qut.
- Dengbêjekî dengzelal e, ji qewmê xwe re neyar e.
- 10 mêr bi rengekî sitrana dibên bi dengekî.
- Ser mazîk e, stû derzîk e.




**14. Sûsik**
- Bager dezî, li palê bezî. (* Ji kewa biçûktire)



**15. Eylo**/Ilho
- Li erdê weke gîsk e, li esman weke nîsk e.

**16. Qişqil**
- Tişteke ji gezê biçûktire, ji bihostê mezintire, ji befrê sipîtire û ji qîrî reştire.



- Reş e reş e mîna qîrr, spî ye spî ye mîna şîr, diçe diçe mîna mîr.

**17. Çûçik**/çoleke
- Tiştekî tiştane, li ser kevra xiştane.
(*Dibît marmêlke bin.)



**18. Meqesok** (* teyreke)
- Reş e wekî qetranî, sipî ye wekî kitanî, sûr e wekî mercanî, difirit diçite esmanî.



**19. Mirîşk û çêlik**
- Xoşka mina xoristan, çil dergoş di destan, ne ber heye ne bistan.



**20. Hudhud**
- Ne li Ademiye, ne li Cinniye, qasidê beyna xelkiye.

**21. Sting**/moz




- Hespê sorê nav çav belek.
- Çume di şikeftekê ve, ya tijî tîteçî, êkê wesa nîne bibeme cutî.
- Hirda wê da di sima gê da, heft mal Ecemek tê da.

**22. Mêşa hingiv**



- Teyrek hat, tutkek pat, ne fitre, ne zekat.
- Bizna kal e, li ser mal e, ne didoşin, ne difiroşin.
- Sed mêr hatin bi rengekî, sitran gotin bi dengekî.
- Mirîşka min çû kepire, zîrça xwe bû şekire.



**23. Cobir**
- Ga dakir, dûv jêkir.

**24. Sîxurr**



- Reşe wekî qîrr, sipî ye wekî şîr, tîje wekî tîr.

**25. Kûjik**/Vîjik
- Perê kewekî, dane bin berekî, bû xêr û şerekî.

(* Dibît tiştek dî bît)

**26. Kêvjale**
- Ser tenten e, bin tenten e, çar çeng û fîl û fert`en e.



- Rimbêlî, dem bêlî, seqlana sutî çêlî, dest û pê çembelî.
- Çûme êş, ecêbek hate pêş, bi çar lingan bû ji xeynî yê pêş. (* dibe şeş rastir be!!)
- Ser deqnenûs, bin deqnenûs, çar çeng û fîl û fengenûs.

**27. Beq**



- Ser qulufetê, îr çune, biyar heye, mû tune.


- Eyar heye mû tune, xwe digvêşe gu tune.
- Çerme û çîqale, mû pêve ne, çar dest û pê ne,
  dûv lê ne.

**28. Mêrî**



- Tişteke min heye, ji vir riz, heta Xalabe tiz.
- Ne ker e, ne hêstir e, bar ji qalibî mezintir e.
- Serê aliman e, navtenga zahidan e, gunêt
  bagîran e.
- Min xalek heye li ser zûrî, sere mezintire ji ûrî/zig.
- Hêstira qero, li bênder/bêderê, ne gur dixwe, ne diz dibe.

**29. Kulî**




- Çume ji vêrê pêda, tiştekê di rêda, lingê li ser
  pê da.
- Çume wêra jûrî, berazekê xinzirî, çukêt wî
  pişta helbirî.

**30. Pêşî**



- Çume mala mîr, pisyar dikim ji mirovêt
  pîr, kê dîtiye teyrê bi şîr.
- Ji tiştan ne ti tişt e, nikil weke xişt e,
  perasû li nav pişt e.
- Ttiştûne serê tiştuy xiştûne, pilek lêda kuştûne, pîre gayê
  zirçûne.

**31. Kêz**



- Reşe û sure ne bizn e, serma dipeçe ne jin e.
- Reşe wekî qîrr, difire weke tîr.
- Reşe wekî qîrr, difire wekî tîr, kutilka çêdike,
  wekî jina pîr.

**32. Gêrik**



- Li vê derê dibe rêz, li wê derê dibe fêz.
  * mêriya bi darên mazi ve.

**33. Şeytanok**
- Sih`ir hêsk, beden nasik, 4 gûçkê bê pêçik.
- Yê keje wekî keşk, yê mite wekî mişk, biharan tere,
  payizan hişk.

**34. kêç**
- Çindik çindik, bazda quncik, bê dil û bê gurçik.
- Hûr e wekî kirzin, reş e weku bizin, hakim ji ber dilerzin.
- Sir û batê, çift vidûnatê.
- Li min filitî, li te xebitî.
- Tiştê min tiştok e, yê bi kulav û dersok e, navê wî
  zirrçepok e. (* bo hine tiştên dî jî dibêjin)

**35. Şaxên bizina**

- Çume şikeftekê ya tijî gupal, êkê wesa nebû
  bideme pal.
- Çûme rêleka bi dar bi dar, qet darekê we nebû
  bikime distar.

**36. Mihdûşîn**
- Qun li axê, ser li qunê, deh le duwa.

**37. Perîna nêrî**
- Çûme duleka bi xire ber, min dapîra te girt, bapîrê min
  xwe havête ser.

**38. Simên bizina**
- Çume şikefteka tijî pêlav, êka wesa nebû bikime pê xo.

**39. Hêstir**

- Rezê bê ber.
- Dê bi hìr hìr, bav bi zirr zirr, kero bê qantir.

**40. Dûngê pezê sipî**/Dûv
- Hêlîna leglegî, ne li berojî, ne li nizarî, hetav sipêdê didetê, ne êvarî.
- Derxûnê qunê, malê girarê.
- Distarokê bi kevlî ve.
  Distarokê, li nizarokê.



**41. Wênê gur**/gurg
- Gur e, mirov dikare bigire.


**42. Dewar** (hesp, mahîn, ker)
- Çar çeqin çeqîn diken, du belbelîn diken, hizar û yek baweşîn diken.



**43. Hirç**
- Li berojî ji tirsa dimirin, li nizarî ji birsa dimirin.
- Hevrist e, tat e rist e, xoş fêhris e.



**44. Fîl**
- Serê mar e ne mar e, diçêrre ne kar e, çar pê ye ne dewar e.



* Gundê Çemseyda/Berwarî-Balla/kilîla vê pirtûkê

## *Metelokên mirov û endamên leşî*

Ev metelok e girêday mirov û endamên leşê wî ne mîna: ``çav, guh, didan, ezman,…..``

**1. Mirov**

- Darekê çar çiqil, her çiqlekî pênc serkêt pêve.
- Ezman sorê didan spîk.
- Seyê netajandî, berxa nemêjandî, mêrga neçerandî.
  (* Se, dayka Hewa, Behişt)
- Elîf gotiye, cîmê qaf bibe lu mîmê.
  (* Xoda, Cobraîl, Quran, Mohemed)
- Dê çim sere Kerkukê, dê vekim bi kurkekê, sed çûçik li dûv mamirkekê. (* hustayê xanî avakirnê).

**2. Mirin**

- Meri bulut, deri kilît.
- Kerê beqala, digerhit li ber derê hemî mala.

**3. Nav**

- Tu bimirî jî, her ji te venabit.

**4. Ezman**

- Tiştekî min heye, her tim li mal e, geh şirîne geh tal e.
- Dernakeve ji mal e, him ciwan e, him kal e, geh şûr e, geh mertal e
- Şirîn e wekî şekirê, tal e wekî jehrê.
- Odek şûştî, bilbilek tê da rûniştî.
- Ji jehrê taltir e, ji hingivînî şirîntir e.
- Gayê surê di gelî da girêday.
- Dustê te ye, dojminê te ye, her ji te ye.
- Him neyar e, him heval e, geh şêrîn e, geh tal e.



- Li vî alî kaş, li wî alî kaş, di nav de heye topek qumaş.

**5. Lêv, ezman, difin/poz**

- Tebeka li ser t`ebekê, ji nav da marê gezekê, di ser da konên rûvî ya, di ser da çirayên zerî ya.
  Tbeka li ser t`ebekê, di nav da marê gezekê, di ser da Konên rûvî ya, di ser da çirayên nebiya, di serda dehlên hûta.

**6. Dev,didan, eziman**

- Odek şûştî, rêzek zilam lê rûniştî.
- Sêniya can, tijî mercan.
- Çome şikeftekê hemî tat bûn, tatekê wilo tune bû nivêjê li ser bikim.
- 32 di qutin, êk didete ber.
- Şikeftuk e, pirr berduk e.

**7. Guh**



- Cêwîn e li kêlek in, ne goşt in, lê nermik in, ev çiye dê fêm bikin ?
- Sênîka val, tejî hingivînê tal.
  Sêniya wale, pir le hengowînî tal e.
- Tiştekî min heye tiştonek.dunya hemû têdeye.

**8. Çav**




- Du Golê reş û hişîn, li ser bejna şan û şîn.
- Du pencerên bê derî, bi şev girtî, bi roj vekirî.
- Sipiye wek şîrî, reşe wek qîrî, tîje wek şîrî
- Çendî bideyê têr nabit. (* çav, meqes, nefs)
- Odek şûştî muştî, cotek qazî têde runiştî.
- Kaniya qinê qinê, mîr û hekîm jî dest didinê.
  (* Bo difnê jî têt.)
- Wî lay pêjan, vî lay pêjan, di nav da morî û mercan.
- Hînî û mînî, ya li bin kûnî, ez yê dibînim, tu nabînî.
- Hêlîna şimfarê, ya li nîveka du guliyêt darê, ne li berojî,

ne li nizarê.
- Wek stêrikan diçûske, deriyê wê wek birûsk e, li ser dileqe birû û bisk e, kî ker nebe wê nasdike!!
- Ne kend e ne lend e, bi kendê ve bend e, bizane çiye û çend e?

**9. Ling**
- Ne dest e lê wek hev e, ne şe ye wek melêv e, pehin dibe bi erdê ve, mirov dipîve gav e.

**10. Dev û didan**



- Koneka tarî, tijî têda durr û mirarî.
- Şikeft yek derî, tê de hene 32 kevrên spî.
- Şkeftek reş, tije mihên beş.

**11. Ser**
- Hevrist bi kevrî ve rist.
- Ban guşt e, bagurdan asin e. (* ser û mekîna sertiraşînê)
- Tistek xweşik heye Xwedê ew daye, zana û roniye, heft deriye, kî nezene bê mejî ye!!

**12. Mû**/pirç



- Bê avdan, bê kolan, bê zibil û bê xodan şîn dibit.
- Hindî bibrî kata ji xwe didet.
- Hevrist bi kevrî ve rist.

**13. Simbêl**



- Postê pisîkê, liser sivîkê.
- Du rêsiyên badayi, li berpal girêdayi.
- Di ser te ra, di bin te ra, kirope di babê te ra.
  * kirope: Katên êksalî yên darê ne.

**14. Kezî**/Gulî
- Cotekî Marê reş, jorda xwe berdan Geliyê
  xweş.
- Du rêz giya, li pişt çiya.



**15. Difin**/poz
- Malîkî mino, tu bi nîkilî ve.
- Girek di pêş te da, du qul têda.
- Kanîka qinê qinê, mîr û hakim dest didinê.



**16. Tilî û dest**
- Ji goşt û hestî ye, Pênc şax û bi destî ye,
  sed û yek huner lê ye, li heywana pê ye.
  De bêjin ev çiye?



**17. Jina bi hal**
- Sindirûka Silêmanî, ne li erdî, ne li esmanî.
- Ne li erda ne li esman e, hêlîna kesrewan e.
- Mirov di behrê da namirit.
- Ji wêda tê, yek li til e yek li mil e, yek jî têda
  vile vile.
- Buxçika çekê mekê, ji Xwedê pê ve kes
  nikare veke.



**18. Memik**
- Serê wî yê vi te, binê wî yê vi deyka te.
- Kundirê di latê de, tamên vê qa dinyayê tê de.
- Şêv bi têxt va ye, qismetek xweşik pêve ye.
- Kanî ya li nizarî/kendalî, mîr û h`akima av jê vexarî.



**19. Kiç**/Qîz
- Ji vêrê heta Balete, hemî mihêt kurrete, girêçka hey, avi
  ne.
- Çil nêriyên tiktikî, gon naxu, guhan dikî.

- Teyrek heye ji hêlîn, 16 sal nafirit, rojek diçit sere zîn, li hêlîna nû digerit.

**20. Şivan**
- Xodanê pez û mêş e, bo e`bdal û derwêş e.

**21. Deng**
- Di ser avê ra diçit sihê nakit.
- Di ser avê ra diçit, ne mirov dibînit, ne sîberê dikit.
- Ne pê heye ne qaç e, ez dimînim, ew diçe.

**22. Şerr**
- Serê şirîn e, binê tehl e.



**23. Sîber**/sî
- Tu li kîrê bî, ya bi dûv te ve.
- Hindî di çimê, nagehimê.
- Vi berî dikevit ker nabit, bi avê bikevit terr nabit.
- Li nav agir gerim nabe, li nav avê nerim nabe.
- Sibe û êvarê ji hevalê xwe mestir e, nîvro biçûktir e.
- Ez diçim, ew jî diçe, ez radiwestim, ew jî radiweste.
- Ne sivk e ne giran, hem bê ruh e hem bê can e, geh dirêj e, geh jî gir e, ewê ji me qet ne dur e.

**24. Patik**
- Hînî û mînî, hêlîna pişta kûnî, ezê dibînim, tu nabînî.
(* Wekî ya çavî ye.)

**25. Kîr**
- Tûk heye ne kar e, xorçik heye ne etar e.
- Çu di konê ve ne mar e, pûrtê pê ve ne kar e, tuvdankê bi milî ve ne cotyare.

**26. Gun**/Hewêcî
- Singê li kevrî çiqay, 2 glolik pê ve hiejay.

## 27. çav, tilî û didan

- Tiştîkê mino tişto, 2 ya sêvek dît, 5 hilgirt, 32 xwar.
  (* 2 çavin, 5 tilin, 32 didanin)

## *Metelokên bêgiyana/necandara*

(darubar, keskatî û qût)

Ev metelok e girêday tiştumiştên bê giyan û neliv in mîna ``darubar û fêkî/Gûz, hinar, hirmî… Keskatî/ pîvaz, kelemî…. Qût/ genim, nok, nîsk….``.

**1. Hinar**

- Dîzka danqut, ji serê gelî çû binê gelî, dindikek jê nerişt.
- Simê gay, tijî birincê qutay.



- Sivorê tiktikî, 107 têşkên di zikî.
- Kumê sorik, tijî morik.
- Hizar mirovêt dibin lihêfkekê ve.
- Himbanok e, pirr danok e.
- Simê gê/gay, tije xwê. (* xiwê li ser nahêt!)
- Sêniya savarê, li quliya darê.
- Sed mal şikakî, ser simê kakî.
- Zerikek/tasek tijî morik e, çi qas tol/dol bike, na rije.
- Min li dikanê kirî hebek, anî malê bû hezar heb.
- Qazana îpraxa berda ji banî, kit neket ber derê xanî.
- Sivorê sik sikî, yê li ser darê pindikî, 1001 di zikî.

**2. Şitî**/Zebeş



- Kevzê mevzê, av tê dizê.
- Behra şîn e, masî reşin.
- Ji serve şîn e, ji nav de sur e.
- Hespê sê, zingîr li pê.
- Gayê beş, dindik reş, tam xweş, tê hûrkirin beş beş.
- Bajêrê şîn e, mirovêt wî di reş in, dîwarêt wî di sur in, kilîka wî jî asin e.
- Çûme çolê çolbeyarekî, heft dûv li pey beranekî. (* şaka zebeş)
- Terr e wek xiyar, sor e wek hinar, şîn e/kesk e wek çinar.

**3. Kulind**



- Yê girêday qelew dibit, yê vekirî zeîf dibit.
- Qesra xodê danî, benî ya der lê vekirî.

**4. Kuncî**
- Herec herec, her êkê 15 derec.
  Helec e malec e, bîst û pazd e derec e.

**5. Nuk**



- Qotu qotu di destî da, singê sur e di pindê da.

**6. Pîvaz**



- Hespê sipiye, bijî şîn.
- Gayê dilo, heftê cilo.
- Ho kilo, heft qat cilo.
- Ser seyd e, şaşik şîn. (* kesik)
- Li bin erdî pata dikit.
- Goka mina sor, têde hene heft çermên spî bi dor.
- Gayên nin e, sor hen e, heft çermên wan hen e, tu dizanî ew çi ne?

**7. Pîvok**
- Mamkê mino, mamkuk e, ya bi kiras û dersuk e, navê wê ziçepuk e.
- Babê te yê mirî, di 7 mêzera werkirî, serê girre kêra kirî.
  * Nêzîkî meteloka mesîn û hêkê ye.
  * Pîvok: giyayeke.

**8. Hijîr**



- Kumê hûtik, tije nûtik.
- Kumê hezî tije derzî.



**9. Hirmî**
- Impîlê darîn e, ewil tal e, paşê şirîn e.



**10. Dirrî**
- Heko yê biçûk rihêt wî di spî ne, heko yê mezin rihêt wî di sor in, heku yê pîr, rihêt wî reş dibin.



**11. Genmok**
- Dara şirîn e, gulî zêrîn e.

**12. Dindika birincî**
- Mamkê mino, hakim yê dibin bergûza ve.
- Mamkê mino, pismîrê bi şepkekî.



**13. Genim**
- Tiştekî min heye, binî ax e, navê şax e, serî zax e/zêr e.
- Di girim mistekê, dihavêm deştekê.



**14. Dexil**/genim dema durînê
- Çav reşê deştê, du pê gehiştê, êxiste ser teniştê.

**15. Dindik**/tovê dexlî
- Davêjim çalê, heta salê.
- Tu bixwî dikeve ber didanan, tu ne xwî dibe gul û gulistan. (* baxçe û bûstan).

**16. Şanahingiv**
- Ez çûme deşta gever e, min teyrek dît bi şaş û perr e, dara hişk e, fêkiyê terr e.
- Teyrek hat, nanek pat, ne fitr e, ne zekat.

**17. Kezan**
- Behra şîn e, av tê nîne. (* Cara bo kevzê jî dibêjin.)
- Bi spî radiçînit, bi surî têdikin, bi keskî didirûn.
- Li binê kevrî bide naşkê, pavê di şikefteka tarî de dişkê.
- Tiştê min tişt e, yê bi ber û pişt e, pavêje hemû deran naşkêt, pavêje şkeftekê da dê şkêt.
  Pavêje pişt hevt çiya çi lê nahê, pavê di kunekê da, dê şikêt.

**18. Tovça**
- bi binêve şîn e, li bazara reş e, li malê sor e.

**19. Bahîv**



- Tenûrka êk kade.
- Huve hestî, wêve hestî, di nav da şekra bestî.

**20. Daqutana tûya**
- Çume serê milekê, pê min kefte qulekê, min kir hewar, sed mêr hatin bi carekê.

**21. Gûza hindê**



- Şîrî didet bê guhan.
- Tiştekê min tiştane, şîrî didet bê guhan e.

**22. Mêwîj**
- Gayê dadikim, kuriyê/dûv jê dikim.
- Çume şikeftekê, lê dinêrim sed pezêt tê, heryekê bi şaxekê.
- Bab şirîn e, korr şirîn e, nevî dîn e. (* mêw-tirî-mey)
- Dayka şîn e, kiça şirîn e, kiça kiçê ya har û dîn e.

**23. Kevut**
- Dara jînê, didet gulêt zêrînê. (* mîna xala 11ê ye!!)

**24. Bacansur**



- Ji serve surî, ji binve xumarî.

**25. Bacanreş**



- Ji serve Reş, ji bin ve sipî.
- Kumê dirêj, tije qirêj.

**26. Kelemî**



- Kiça mela, bi hizar kirasa.

**27. Xanik**
- Yê bi sê linga, yarê jinka.
- Sê bira bi şaşkekê.
- Lawkê deştanî, bi sê piya xwe digirit, bi 2 piya dikevit.

**28. Kivark**



- Ji serve hosan e, ji binve Qoran e.
- Qurana li binê dinê, hindî şêx û mela hatinê,
  neşyan bidene xandinê, dihête xarinê.
- Çûme şarê şik tê nîne, min guşt xar hêsk tê nîne.
  (Der arme Tropf, hat einen Hut und keinen Kopf, und hat dazu nur einen Fuß und keinen Schuh./Elmanî)

**29. Nêrgiz**
- Binê axîn e, navtenga şîn e, serê zêrrîn e.
  Ser zêrînê, bin axînê.
  Binî şîn e, nîvî sax e, serî zêr e.

**30. Nîsk**



- Tiştê min tişte ne bere ne pişt e, hema bi xwe bi
  xwe tişt e.

**31. Guhîşk/**Helhelok
- Dara li nav dara zerdikit ji gohara.

- Kerê etara, xwe zer kir ji bend û guhara.



**32. Gul**

- Bi pel û stirîne, li ber dilê bilbil şirîn e.

**33. Gûz**

- Tenûra zimzimî, tijî nanê genimî.
- Tenûrka du kade.
- Qesra şûştî, du begzade têda rûniştî.
  Qesra şûştî veşûştî, du feqe têde runiştî.
- Oda miştî, 2 feqe tê da runiştî.



**34. Pembû**



- Heplepan û heplepan, giya şîne, belgê pan, kurê pîr e babê can.
- Cuxîna li pişta banî, ka çêtire ji danî.
- Me çandin wekî nuka, şîn bûn wekî sêveloka, pêve hatin wekî gûzeloka.
- Ji vêrê pêda, min ecêbiyek dît di rê da, kê dîte mak di zigê berxê da.

**35. Belgêt çolî**

- Ji serve hosî, ji binve pirasî.
- Tiştîkê min tişt e, 7 pirasî li pişt e, ne xûn e ne guşt e.



- Ji vêrê heta Awka, hemî piniyên kalka.
  (* navê gunde)
- Çu nizarê xalka, tijî piniyên kalka.
  (* navê girekî ye)

**36. Golîl**

- Ji vêrê heta Mûska, hemî rritlêt gîska.
- Ji vêre heta Sindur, hemî lawêt ritil sûr.
  (* mûska û sindor gundin)

**37. Dîha çolî**

- Çume ji vêrê pêda, pîrejineka di rêda, çend zixtêt dunyayê têda.

## *Metelokên tiştumiştên navmalê û amûr*

Ev metelok e girêday tiştên berceste/madî û nelivên di mal û dewrobera da, herwisan amûrên mirovî bikaranîn û nû dihên çêkirin.

**1. Hêk**

- Tiştîkê min tîştok e, yê bi kolav û dersok e, navê wê zirçepok e. (* Bo pîvokê jî bikar hatiye.)
- Xalê min Emer e, sê kurtekên dibere, du sipî ne êkê zer e.
- Hate meydanê Inter, 3 kortekên diber, 2 sipî ne, êkê zer.
- 2 avêt di tirarekî da, na çine navik.
- Qesra sipî bê derî.
- Xanî yê bê derî.
- Quba bê kutek.
- Lawê zerê di qesra sipî da.
- Min tiştekî dîtî, du reng av di navde dişimitî.
- Xaniyekî gilovir/girovir û sipî, bê pencer, roj û derî, tê de rûniştiye bûkek e zerî.
- Çume ser banekî, berê xwe dideme ber banekî, 2 avêt di amanekî.
- Emer e Emer e, sê pêstê sipî yê li bere , êkê zer e.
- Hate mala me Enter, du kurtekên li ber, êk sipiye êk zer.
- Mamê min Heyder e, sê qutkên li bere, du sipî ne êkê zer e.
- Metelok û metelok, qûna te dikim mencelok, avkên bana, şilqa li xwe didet, yê dibeme Duhok.
- Rûto ji pûrto di bit, pûrto ji rûto dibit
  (Ich weiß ein kleines weißes haus, hat weder Fenster noch Tore, und will sein kleiner Wirt heraus, muß er die Wand durchbohren./Elmanî)



**2. Tìrazî**

- Ecêb e lew ecêb e, mahîna şeş rikêb e, koriyeka bi dûv ve,  êka bi piştê ve
.

- Heft bend û bendilkek, 2 nan û kotilkek.
- 2 bend û bendilkek, 2 sênî, dar û kotilkek.
- Heldim, heldim, şeş pê û du sim.
- Benik benik, şeş benik, yek derik, du kodik.
- Sê ben û defek, 2 def û darek.(* şaşî tê da heye!)
- Şeş bend û bendilkek, darek û 2 dewil û kutilkek.



**9.Tifeng**

- Dema jêhel diçit berê wî li jurda, dema jurda diçit berê wî li jêhel.
- Tenûra metê, pelek ketê destê kesê nagehtê.
- Mirovê bi lingekî çu şerê gondekî.
- Deve orya, pişkul firya? (* Deve: h`eştir)
- Ker zirrî, posil firrî.
  Ker z`irrî, pişkil jê firrî
  Ker zirriya, pişkil firiya.
- Marê mirî, tirr kirî.
- Ga orî, pişkil firrî.
- Bi qûnê dixot, bi devî dirît.
- Tiştekî min heye, dev dirêj e, xwîn dirêj e, dest diavêjmê ber diavêje.
- Dev dirêj e, xwîn dirêj e, desdavêmê, berdiavêje?
- Çûm serê darê, diqutim bizmarê, deng diçit hizarî.
- Bi binî dixût, bi devî dihavêt.
- Tiştekê min tiştan e, heke te dest havêtê dengê şeşa ne, heke te dest jê berda, miriye û ruh tê nîne.
- Di ser avê ra diçit ter nabit. (* tifeng-sîber-ronahî-deng)



**10. Rext**

- Dane quta qutayi, li rêza kara danayi, bo xolamêt axayi.

**11. Gule**



- Duxkê vizê, çu ber bizê.
- Kur tê ji dûr tê, gava vedireşe xwîn tê.

**12. Quran**



- Çil taq in, çil bertaq in, çil ode ne, ji çil di zêde ne.
- Sê taq e, sê bertaq e, sê derge ye, sê hucre ye.
  (* Sê cizî yêt Quranê)
- Çil derp e çil derpîç e, çil xolam e çil xecîc e.
- Çil çît in, çil berçît in, çil xidam in, çil xulam in, çil xecîc in.

**13. Distar**



- Sindorûka li ser sindorûkê, kilîla di destê bûkê.
- Ez çume Elkûşka/oda, tax, xani jêrî, min dît jina li ser mêrî, min gutê dê çi lê key? Gut: Dê înim nêrî.
- Berek li ser berekê, teyrek dixûnit li dolekê, kuna qûnê li nîvekê.
- Te dibeme lateka asê, di kunê diqutim lûliya dasê.

**14. Aş**

- Hindî bikenê tijî nabit, hindî bidenê têr nabit. (* aş, meqes)
- Firrfît û firrfît, bo te û babê te dirît.
- Gîskê gorrî, li avê xorrî.




- Tebeka li ser tebekê, kona qunê di nîvekê.
- Çi diken karê ew dihêt xarê.
- Gîskê gurrî, li ser avê/rubarî  xorrî.
- Him himo, li ber çemo, ne diz diben, ne gur dixot. (* Hindek dikene Distar.)
- Hindî dibezit, ji cihê xwe naçit.
- Him hima li ber çema, ne gurg dixwe ne diz
- Sindorîka li ser sondirîkê kilîla di destê bûkê.
  (* bo distar ji tê)

**15. Mesîn**



- Babê mirî kîrê rrep.
  Mirî yê kîr rrep.
- Ji serv e qirêj ji bin ve nivêj.
- Ji Heleb û Wan tê, bo qûna babê te tê.
- Hu dikit hu dikit, bo derê qûna te şul dikit.
- Navê wî zerbenduke, yê bi kulav û dersoke.
  * nêzîkî mamka pîvok û hêkê ye.

**16. Dergih**



- Heru dîkil te difisînit.
- Qeşê bi riha ve hilawîstî.
- Tiştekê min heye bi rihên xwe ve lidarxistiye.
- Apê minê rû kurkirî, şev û rojê bi dar ve kirî.
- Heta bab kîrê xwe nekêşit, biçûk nanivit.
- Mamê min bi lingekî, hemberî gundekî.
- Babê te li ser kîrê xwe dizivrit.
- Bapîrê te her spêdê heta êvarî li ser binê xwe dizivrit.

**17. Gure**



- Da te dikit, babê te têrra dikit.
  Dayik dikit, bab têra dikit.

**18.Garîte, Nîre û Bagorda**n
- Êkî gut: Ay piştê, êkî gut: Ay teniştê, êkî gut:
  Ax çend li min xweş tê.

**19. Garîte**
- Babê mirî biçwîk û miçîwîka serê pêvenay yên bo diken
  girî.

**20. Gûzan**/mus
- Bizn/ga-hêstira melay, çu serê çiyay, nehêla daveka
  giyay.
- Ûşoyê qun xwar, çû serê latê, lat îna xwar.

- Gulkê melay, zilek nehêla li serê çiyay.
- Berxka serê çiyay, nahêlit daveka giyay.



**21. Cerîfk**/sivnik
- Qeşê rih dirêj.
- Tişt û mişt, çu li wêra he runişt.
- Xişt û xişt/mişt çu dira/wêra he runişt.
- Kir xişt e xişt, çû dira he runişt

22. Şûtik/ Doxîn
- Li dur te wertêt û te nagêt.



**23. Dûkêl**/kadî
- Mêzera Sultanî, bê dest û pê çu ser banî.
- Tiştê min tiştanî, ne pê pêvene ne panî, bi xwe diçite ser banî.
- Him him e, dîwar sim e. (*bo darukey jî tê gotin)



**24. Îprax**
- Metelok metête, Qeşey rîte devê te.
- Birinca bi şel û şepik.

**25. Bagurdan**/Pangor
- Uşe keru, bi dû min ra weru.
- Zivistanê bi şul, havînê betal.
- Hîno mîno, du qîno.
- Pê pano, li ser bano.
- Çû kero, hevsar zero, li du min wero.
- Ne ker e, ne maker e, hefsarî bide sere, hêdî hêdî li berî herre.
- Helbet helbet, ava li bana şilqa vedidet, Şileymûnkê kata ji xwe didet.

**26. Xîvet**/kun
- Ji dûr ve hindî Gayekiye, ji nêzik ve hindî Çiyayekiye.
- Mûyê/pûrtê kara, li ser dara.
- Tiştekê hey heku dinivit hindî gaye, heku
  radibit hindî çiyaye.
- Dipêçî, barê gaye,vedinî wek çiyaye, bi sere
  de tê baran û baye, girêdane bi werîsaye,
  malbat tev libin razaye.
- Mûyên k`aran, li ser daran, di bin de distirin bi hezaran.



**27. Kolav**
- Serevraz kî dê vala bit, sernişîv kî dê tijî bit.
- Ser spiye, ne meleye, pê paniye ne deveye. (!)
- Demê sernişîv diken tijî dibit.



**28. Qazan, agir û hiskûk**
- Hudhude harbû, Reşwêl e lê siyarbû.
- Helhele har e, reşkele siyar e, dûvdirêjk xilmetkar e.

**29. Rê**



- Şûtka du ta, heta Bexda.
- Tiştekê dirêj e, sîber nîne.
- Diçit serê çiyay, nalivit.
- Ji vêrê heta Bexda/Helebê, hemî cangê du ta.
- Ji vêrê heta mala Obeydullay, hemî cangê qutay.

**30. Meqes**
- Min darekê 2 gulte, da nav lingêt babê te, li
  wêra he bû qiçqiça da/diya te.
- 2 têrra, 2 vêrra, çilfindê, hay çilfindê.
- Hemzeko, di pişta xwe ve neko.
- Stûna 2 gulte, dana bin ritlêt babê te, bo çîzçîza deyka te.
- Heta tu tilêt xo nekeye di çavêt gurgî ra, mihê naxot.



**31. Telhe**



- Ser dês e, bin dês e, çeqil û meqil bi xirnês e.
- Tiştek  min heye di rê da, yê sax hat pê da, yê mirî, sax li erdê da. (* dav, telhe, xefik)

**32. Lempe**/Çira-Momik-Fanos-Lox

- Tilya tirî, xanî tijî/run kirî.
- Tiştekî min heye biçuk e, lê tijî odekê ye.
- Tiştekê min heye li ser refikê, dide defikê.



- Tijî çengekî, tijî xaniyekî.
- Xanima ser kursî, dixwe nanê bi tursî.
- Ser zêr e, aqil ker e.
- Behrek av, marek li nav, teyrek li hindav.
- Temet tiblekî, pir dikit odekî.
- Ez çume bi rê da, birkeka di rê da, marekê tê da, çûçkeka di devî da, ew mar bi wê avê dijit, ew çûçik bi marî dijit
- Heke kaniyê mar têda bit dê zêt, heke derket nazêt.
- Tiştekî mino tişt e, av e ne av e, marê mirî li nav e, teyrê zêrî li hindav e.
- Av e ne av e, mar ê reşê li tav e, taca zêrî li hindav e.

**33. Bivir**/ Das



- Temerê /Emerê leng, li çiyay kire deng. Melayê leng, li çiyay kire deng.
- Xalê min a xal a, dojminê kendal a.
- Qeşê bi lingekî, çu şerê gundekî.
- Qasimê qunxwar, çû şerê dar, dar anî xwar.

**34. Kil û kildan**

- Bîr ji çermî, dolik ji darî, av ji berî.

**35. Pare**



- Ji berî reqtire, ji şekirê şirîntir e. Ji berî reqtire, ji ruha mirov şirîntir e.

**36. Kaxez**
- Dunya hemî diçitê, kefeka pûşî naçitê.
- Li berî bidey çi lê nahêt, li avê bidey dişikêt.

**37. Teşî**
- Serî gupal e, nîvekê bêder e, binî tîruk e.
- Tiştê mino, direqisit, ne dixot ne vedixot.
- Serstûrê bin zirav.

**38. Derzîk**/şûjin

- Hudiken hudiken, şula quna te diken.
- Çav tune lê dimeşe, lig tune lê şop dihêle.
- Ser kunê bin tîj.
- Şervan dixemlîne, hemû ji wî dirazîne, lê bi xwe rût û tazîn e.
- Dêlka harî, çu koneka tarî, îna derî hestiyê binê pê marî.

**39. Kefçik**
- Dihilhête te, dadihête te, reprepîskê xwe dibete te.
- Deyka te heru qefteka kîra dişut.

- Ker bi bar ve çu di şkeftê ve.
- Ew diçe hundir, gewde dimîne li derve li dûr.
- Deve bi bar çû zinar?

**40. Gura rîsî û şîşik**
- Pênc bira qesrekê avadiken.
- Sêheb birayên hevin, her roj çavên hevdû derdixînin?
(* şîşkên gura)

**41. Girkêt hevîrî**
- Herru sipêdê dayka te teşteka hêka dikit.

**42. Tirektor**
- Cot dike ne ga ye, xwarinê dixwe, birçî nabe.

**43. Teyare**



- Ne li erd e, ne li esman e, hêlîna begrewan e.
- Gayê kejo, li hewa dajo.
- Agir û asin, kelê mezin, vêkra dibezin.

**44. Piyale**



- Tiştekî min heye tiştanî, ne pê heye ne panî, her roj diçe kanî. (* pitir bo mesîn, cer … ji dibe)

**45. Pêlav**



- Qasî kewekî, digerîne barê kerekî.
- Lat û lat, min pê tev da evqas welat.
- Tiştek heye ku girêdidim diçe, vedikim naçe.
- Ez siwar bûm ne zîn e. girêdidim bi rêve diçe, vedikim disekine.
- Min hulek havête dolekê, dol dirya hul ne. .

**47. Neynik**/Eynik



- Ew di hundirê malê de, mal di hundirê wê de.
- Şewqa wê da newqa min .
- Bi şevê nabiriqe, bi rojê dibiriqe.

**48. Pir**



- Pisê pisê nêrgizê, liser avê dihezê, ne gur dixwe ne dizê.

**49.Hevîr**/girkên hevîrî
- Le hawîn û le zistan, lê deden be kolemistan. (* ji Zagroz tv)
- Heru deyka te komeka hêkên qaza dikit.

**50.Şerwal**
- Serî yeke binî du, di qûna bab û bapîran ra çu.

**51. Supe**/agirdan
- Gewru di rît, soru dihavêt.
- Sê tilî sê pê ne, li nav deştê ne, mîr û hakima pal lêne.

**52. Meşk**
- Deng jê dihêt, rih tê ne.
- Dema mast didimê, bi reqasa xwe re nîvişk li min vedigerîne.
- Sên lingo di siyê da, dun lingo pêda, devê wî li ber zikê diya te, gûyê wî di devê heftê bavê te, tu çawa dikî kêfa te.
- Tipên e xoş tipên e, du destin du pê ne, deng jê tê ruh tê ne.
- Ser nişîve, ling li hewa, spêdê radbin ji ber xewe, karê bêrîvana ewe.
- Tiştekê min ji tişta, derê wî li dayka te, gûyê wî di de devê babê te.

**53. Dest conî**
- Marhulîsê di kurê da di lîze.
- Hirve ber û wirve ber, yê di nîvê da mîr Omer.

**54. kurî ya hespî**/dûv
- Texa çulî bi kevrî ve.

**55. Rejî**/Komir
- Mirîşka reş kibab e, çiyê bixot se bab e.
- Reş e di agir de sor û gewr e.

**56. Kiras**
- Qesra du der e, ji derekî derdikevim, ji derekî serdikevim.
- Qesra 2 der, tê çûme der, Ilahu ekber.
- Pat e/mil e bê ser, pişt e bê zig, dest e bê pê.
- Dara di dulê da, dul rizî, dar ma wisa.
(* Cilik dema diken berxwe)

**57. Kilmwîş**
- Maqûl hildigirin, feqîr dihavên.

**58. Mîkrob**/Vîros
- Ne li erdî, ne li esmanî, dixut guştê xodanî.

**59. Name**



- Qîz û vîz, çu bajêrê Ebdulezîz.
- Kaxez e çîzavîz, çû bajarê Ebdilezîz, tîne kêfa xort û qîz.

**61. Sehak**
- Her hemam, hemam hemam, siyarê urtê temam, bav mele, qîz îmam.

**62. Malhisînk**
- Mamê memo, bi lingekî, çu şerê gundekî.
(* bo bivir, das … jî tê)

**63. Himban**
- Du dest in, du pê ne, qalib e ruh tê ne.

**64. Kunê avê**/Cewdik
- Diya te heru, Erebê kîr reş dihavête ser xu.

**65. Durka derî**/Kilîl
- Diya te heru, hinde rapêç dikit. (* anku: didete ber)

**66. Gû**/Pîsî
- Min hilkir bi bêrê, te hêla bi pozî kêrê.

**67. T`ir**r (* bayê ji ber mirov diçe)
- Pisik nine bivêje pişt û Kuçik nine bivêje oşt.
- Ne deriyê wî deye, neyi pacê wî heye, tê û diçe.

**68. Semawir**



- Binî qul e, serî qul e, di nav de av û agir e.

**72. Darbirîn**
- Ez çume newalekê, jê tê dengê birîndarekê.

**69. Tirên**
- Or or dike, bor bor dike, qesta bajaran dike.
(* Bo avê jî dibêjin.)

**70. Sêwan**/Şemsî



- Vekirî kon e, girtî gopal e.

**71. Agir û dû**/ dûkêl
- Hilindir milindir, kur/law ji babê bilindtir.

**72. Def**



- Ez çûme serê banekî, min lêxist gopalekî, deng çû welatekî/newalekî.

**73. Dewil**/Dolik
- Şerbikê pîrê, çû binê bîrê.

**74. Mîrkut**



- Tep tep dike, şeq şeq dike, genim bê sitar dike.

**75. Sûta kewa**
- 10 dar û 2 ben, êxsîr tê da bûye reben.

**76. Sêvbinerd**
- Ji ser ve şkêr e, ji binve zêr e.



**77. Radyo**
- Sindoqa tijî têl, deng dide pêl bi pêl.

**78. Xwê**
- Pîremêrê  pişt keliştî, dermanê hemî tiştî.

**79. Lepik**
- Destekî çermîn e, bi demar e, bê xwîn e.



**80. Nivîn**
- Tiştek e min heye, bi şevê bûke, bi rojê pepûk e.

**81. Xew**
- Ji şekirê şirîntire, ji asinî girantir e.
- Tişteke ji risasî girantire u ji hengivînî şrîn tir.

**82. Berfe mêr**
- Mêr e ji baranê dibizde,  ji germê bi xwe de dimîze.

**83. Milhêb**
- Çûme serê banekî, min berêxwe da aqarekî, 7 kilîlên di devê marekî.
  Çûme rêkekê, rêk li darekê, 7 kilîlên di devê marekî.


**84. Çekoçê şekir şikandinê**
- Çûme rêlewarekî, birim serê darekî, kirme qaziyê şarekî.

**85. Sabûn**
- Li ser destan dişimite, dikeve çav dişewite.



**86. Coxîn**/Bêder
- Befir li beroja dihêt, gijik li nizara. (!)
(* Ne di cihê xwe daye.)

**87. Çante**



- Her roj li dibistan e, lê tiştek nizane.

**88. Dolab**
- Gayê li nav govê nivistî, pezê li dûv qunê ve damiştî.

**89. Zengil**



- Hildidim digirî, datînim aşt dibî.
  Hildigirim digirî, datînim nagirî.

**90. Agir**




- Tiştekê min heye çiqas bixwe, têr nabe.
- Sê birane, êk diçit nahêteve, êk dimirit
  narabiteve, êkî hindî bîdenê têrnabiteve.

**91. Qelem**/Pênûs



- Mele ye mele nîn e, aqilmend e, ruh`tê nîn e.
- Pênc di saxin, na axivin, êk miriye di axivit.
- Tiştek e hemî di binra diçin.
- Ximav û xar, lastîk û dar, tilî lê hewar, li  kax`ezê bar,
  tîpên yar û har, digirin rêz û tar.

**92. Pirtûk**



- Çini çini hezar çini, Meri dûnin hilçini.
- Şuva sipî, xeta reş.
- Wekî pirpel e, nivîs lê bel e, bi bend û bal e, ji te re heval e.

**93. Nexşe**
- Çiyayê bê kevir, deryaya bê av, rêlê/daristan bê dar,
  bajarê bê mirov.
- Bi pişt e, bê zik e, bi dest e, lê bê ling e, bi dev e, bê
  didan e, bi çav e, lê nabîne.

**94. Newroz û hatina biharê**
- Daran movik anî, mêşan hingiv anî, miyan şîr anî, kewan rê danî, fesad tazî mayi, mîran xwe da alî, gayan şer hilanî.

**95. Têlefon**

- Li Amedê şîr rija, bêhna wî hate vira.
(* dibe ne gelêrî be)

**96. Xem**
- Ne li erdî, ne li esmanî, dixot leşê însanî.

**97. Tenûr**

- Derê wê reş e qubhet e, nava wê sor e, edawet e.
- Kewara agir, hevîr dike nanê hazir.
- Destim le naw wirgî, wirgî be wurge minar e.
- Lêv Reş e bi qîmet, nav sor e bi helamet, bi terî dibemê, bii hişkî diînimeder, sela ela Pêxember.

**98. k`ar**
- Babê mirî gilvilekê di qunê ra

**99. Welat**
- Dayka daykan e bo mrovî nav û nîşan e.

**100. Berîk**
- Belot belot, ji serve req e, ji binve pot.


**101. Baskê cigara**
- Ji serve nivêj, ji binve qirêj.

**102. Site û bersite**
- Req bi reqî dikevit, sor bi nermî dikevit.
- Dayik berok bav berok, çêlikan tîne sor û zerok.

**103. Hevcar**/Hincar
- Şeq şeq şeqşeqî, kete erdî, erd peqî.

**104. Şixarte**
- Sed terim yê di tabîtekê da.
- Çum bajarê lakêşe, hemî mirovên li wir, ser sor in bin sipî ne.
- Ji zigê diya xwe derdikevit, pişta babê xwe diperixînit.

**105. Mencilok**/Derguş
- Diya mirî, devê beş.



**106. Xencer**
- Vî alî dar, wî alî dar, di navda 2 têşkêt har.
  Hêrve dar wêve dar, yê di nav da kûçkê/seyê har.
- Ji vê ve dar e, ji wê ve dar e, yê di nav de seyê har e.
- Ga di gelî da, gelî dirizit, ga narizit.

**107. Cerê rûnî.**
- Hêrve ax, werve ax, di navda mîr bidax.

**108. Lanik**
- Ho dilivit, ho dicivit, ezman nîne pê baxivit.
- Herîşan û perîşan, cihê axa û feqîran.
- Siwarê me bi nîşan e, li ser maîna bê giyan e.

**109. Tirpan**/şalok



- Helotirr, melotirr, sîng sipî yê mil kutir,
  li hemî zevvya dikit tirr. (* bo gûzanê ji dibêjin)
- Mam hesenê bi lingekî, çû şerê gondekî.

**110. Tizbî**
- Hindî dikêşit, xilas nabit.

**111. Mencela ser agirî**
- Helhey har e, reşwêley siyar e.

**112. Bîcame**
- Dara du tayi, di te hildayi.

**113. Xizêm**
- Ya zer e, li guştî hate der e, ya bi per e, ya kêm ser e.

**114. Sebîl**/qelûn

- Cuwa darî kutela axê tijî xwelî.
- Ka disojit, kadîn dimînit.

**115. Sêl**
- Ebdekê hey yê reş e bi guhar e.



**116. Seet**
- Sê tasin, sê bin tasin, sê neynîkin, sê reqasin.
  Sê tasin, sê bintasin, sê berbûkin, sê reqasin.
- Ne dixwe nejî radizê, bi şev û rojê dixebite, tucarî nasekine.

**117. Muxil**
- Çi di xot bi serê xo werdikit.
- Tiştekê hey li dinê , hindî bikenê têrnabit.
- Ezmanê darîn e, berfê dibarîne.

**118. Hizir**/Dalxe
- Tiştek xoştir di hemî tişta da diçit.
- Dûr difirit ne çivîk e, ne giran e, ne sivik e.
  Dûr difirit, ne sivk e, ne giran e
- Ne mezin e, ne gir e, e`rş û e`sman digere, ew ne kur e, ne keçe, herdem bi wê rêçe.

**119. Gor**



- Bajar e, bazar nîne, sîber e, hetav nîne.
- Koşka tarî û bi mar, bi dûpişk û cinawar.
- Sindoqa Silêmanî, li hemû cî û bajaran danî.
- Bajêre deng jê nahêt, sûka bazar jê nahêt.

**120. Çiya**
- Ne mezinêt wan biçûk dibin, ne biçûkên wan mezin dibin.



**121. Çadan**/Qorrî
- Pîrê tê nava cumetê, heta mîza xwe neke naçe.
- Dê bi hir hir, bav bi zir zir, kero bê qantir.

**122. Werîs**
- Dirêje ne mare e, kej û h`ite ne kar e, serî hişke ji dar e.

**<u>Şeş metelokên  bê nav:</u>**
- Ez çûme ser girî, kê dîtiye dewrê 7 zemana, dar xw pavête berî?
- Tişto tişto, li dûv min were, ne maker e.
- Kerê mam Heyder e, cihûrekê kayê min dana bere, qrîş li dûv min were.
- Ser di te ve, bin di te ve, kirope di babê te ve.
- Tiştikê mino tişto, ser di berê ra, qun ji derve, kîr di pozê ra.
- Ser li ber e, qun li der e.

## *Metelokên Jîngeh/seqa û valayi*

Ev metelok e girêday mijarên seqa (av û ba) û tiştên di valayiya di navbera erd û esman da mîna ``birîsî, dilop, rûbar, roj, ....``

<u>Esman û sitêr:</u>




- Şkefta reş, tijî gayên beş.
- Sêniya can, tijî mercan.
- Mêrga şîn, tijî helal û beybîn.
- Dersokeka gulgulî, tijî sêvên sorgulî.
- Kepreka bê stûn e.
- Tenûra dimdimî/zimzimî, tijî nanê genimî, spêdê rabîn xetimî.

<u>Hetav û roj:</u>

- Tişteke ji cihê xwe nalivit û li hemî erda digerhit.
- Pe sur û pe badîna, 2 zevî ne.

(* Bê meinaye.)

<u>Sitêr:</u>



- Tenûra metê pelek ketê.
- Sênîka mircanan, li serê banan.
- Mêzera sultanî, tijî sêvên zemanî.
- Pezê Mihema êvara kete çema, sipêdê Rabûm lib jê nema.
  Pezê Hema, berda çema, heta sipêdê kit jê nema.

<u>Ewir</u>



- Mencela çiftê, qirpên keftê.
- Tiştikê min tişto, difirit yê bê per e, di girit yê bê çav e.
- Weke kulavekî sûtiye, ji vir heta Bexda raxistiye.

Hîv



- Tasa/elba mast, li guhara rast.
- Cama mastî, li ser destî, req rawistî.
- Bazina sitiyê, kete kaniyê, şewqê da Amêdiyê.
- Bizna kal, li ser berekê val, hindî gazî dikimê nahête mal. Bizneka kal, li ser kendal, yar yar dikimê nahête xar.
- Hespê belek, li binê deştê bû xelek.


Roj



- Bazinkê Sitî yê, keft kanî yê, şewq da Amêdî yê.
- Zerîfa serbanî, keziyên şurrbîne binê banî.

Esman, heyv û roj
- Serê dinê, binê dinê, du guhîj bi tenê
- Behra şîn e, av tê nîne, 2 mar tê da xişîne, êk hesp e, êk mahîn e.

Hîv û stêr



- Her her dîwar, ber ber dîwar, xanim yek e, carî hizar.

Roj, hîv û stêr
- Her her diyar, merr merr diyar, çil kose, du xanim, gulî hizar.

Roj û Hîv
- Behra şîn e, du mar têda xişîne
- Tata şîn e 2 Hesp pêve hejîn e. (* Tat: Bet`ena çiya.)
- Serê dinê, binê dinê, du kon jê tenê.

Sal
- Dara bayê, 12 tayê, her tayekê hêlîneka lê, her hêlînekê hêkeka têda, her hêkekê navê xwe yê hey.
- Çar bira ne, çar diyar, yek gerim, yek hênik, yek şilî, yek

sar.
- Çume bestekê, min av vexar bi mistekê,12 aş geryan li ser
bistekê. (* Salek 12 hîv e)
- Mamê Xelîl e, dergihê wî bi 12 kilîl e.

Havîn
- Mencela Hembelî, birrêne ya dikelî, ne agir e ne xwelî.
- Mencela Indelî, pirç pirç dikelî, ne agir e, ne xwelî.

Roja Xotbê/înî
- Çume serê darekê, radihêlim hişke hewarekê, sed mêr dihên bi carekê.
Êk diçit serê darekê, dikitin gaziyekê, sed mêr dihên bi carekê.

Birwîsî
- Deng tê ji esma, qîjîn dikeve newala.



Mij
- Guloka mû, li çiyê werbû.

Baran
- Marê mirî, erd qul kirî. (* wekî meteloka dilope)



Ba
- Ga di ser ra diborî, çêl li çema avis dibî.

Cemed/Qeşa
- Hanîka manîka, ferşê ber devê kanîka.
- Anîkê manîkê, çû ber kanîkê, rê neda heywanekê.

Derya
- Goleke şîn e, tije çirayên rengîn e.

Coka avê
- Tifenga xala, ya li der mala.
- Hade û made, korîka xo bade, here dinav zevîka bi qurad e.

Dilopa avê
- Tiştekî min heye, gora xwe bi xwe dikole.
Tiştê min yê mirî ye û bi xiwe gurê xwe dikulit
- Spî spî, dibê şil dike, erdê jî tim quldike.
- Fatimko, erdê simko.
- Sor sorik, erdê dikolik.
- Tiştê min li çik e û êdiz e.




Befir/Berf
- Hat wekî mîra, runişt wekî wezîra, çu wekî feqîra.
- Sipiye ne şekir e, difire lê bê per e.
- Gayê kejo, di esmanî re diajo.
- Ebabekrê li ber dîwara.
- Spiye ne şekir e, difire bê perr e, çiyan di bin xwe de digire.
- Dihêt şîr e, dirunit mîr e, diçit ebdal û êxsîr e.

Av
- Hada û bada, çu nav werzê qurrada, têr xar û koriya xwe bada.
- Hurr hurr dikit, bûrr bûrr dikit, qesta dergihê Stembol dikit.
- Tiştekî min heye diçe, li pişt xwe nanêre.
- Hindî bişûy, pîs dibit.
- Dojmin e lo agirî, bi ton dara hildigirî, bizmarekê ranagirî.



Rûbar/Çem
- Bê ser û bê ling e, di herike li bajar û gund e.

- Çêla zayi, di geliya badayi.
- Hindî bideyê dê xot.
- Hindî bêjî, dê dirêjbit.
- Xwar e ne dar e, dikale ne kar e, dixushe ne mar e



## *Metelokên bîrkarî* ( [28])

Ev meteloke jî çend beşek in mîna:

**A. Birkariy meltelokî:**

Di vê beşê da pirsên bîrkarî têne kirin bi rengê meteloka/ helbestkî, bersivên wan bi hijmarî /hisêb tên dan.

- 366 quling hêlînek e û 2 têjik.
  (* Hijmara rojêt salê, esman, heyv û roj)
- Roja navî, şeva navî, 7 bira li pey hev direvî.
  (* Heft rojên heftiyê)
- Şêstuduker, di serê milekê kirin der, şeş goh û sê ser.
  (* Şêsto –mirov e- + 2 ker, di bine xwedî sê ser û 6 guha.)
- Çar destin, çar pê ne, du qun in, êk li ser pêye, êk li ser piştêye. (* Siyar û dewar)
- Çiwar çelê, guh belê, 12 gulê pîr xertelê.
  (* 4 pê, guhên bel, 12 guhanêt biznekê).
- Çar di çeq in, sê dileq in, du di zeq in, du di req in.
  (* 4 pê, 2 guh û kurî, 2 çav û 2 şaxêt biznê)
- 4 di zeq in, 4 di req in, 8 di çeq in, 90 pêve, 18 tê ve, ji vêrê û wêve. (* 4 çav, 4 şax, 8 pê , cutek ga)
- Bêrî 4 kiç hene, her kiçekê 6 kon hene, her konekê merrek heye. (* kon û bizmarên nalên dewar)
- Şirînok li darînok, darînok li guhbelok, guhbelok birêket, pêpehnok bidûvket. (* ker, barê tirî û karwanî)
  Şirînê şarî, hinginê darî, guhbelê bi rê da, pê palê bi dûv da.
- Êkî ditena, bi pênc şahida ve. (* taret, kevçik û tilên destî)
  Êk di mirovî dinit, pênc şahidin.
- Ev çî ye? Sibe çar e, nîvru du ye, êvarî sê ye.
  (* zaro bi çar lepa diçit, dibe genc bi du ya, dibe pîr bi du pêya û gupalekî)
  Spêdê li ser çara dicit, nîvru li ser du ya, êvarî li ser sê ya.
- Li çerxî da carek dihêt, di salê da çi car nahêt, di deqîqê da, du car dihêt. (* Pîta Qafê)

---

[28] . Ev nivîsên di kivana da û biçûk bersivinên wanin.

- Ez çume girê delal, tê da hebûn çar kaniyên zelal, du yên sor, du yên tal. (* ser, 2 çav, 2 kunên guhî)
- Du qulê roviya, du çirê neviya, aşek bê av di bin da geriya? (* poz/difin, çav, dev)
- Ez çûme ser girê Deilêdizan, 2 marên reş, 2 stêrên geş, 2 kun rûvî, şikeftek tijî mirarî.
(* ser, birî, , çav, 2 kunên difnê,dev, didan)
- 2 kan in 2 ban in, 8 bêrî û 2 şivanin.
(* 2 lepên (kef) destî, 2 pişte dest, 8 tilên biçûk, 2 tilên mezin)
- Dûr li min nêzîk bûn, du bûne sê, sih û du ya ma ket û cût. (* pîrî: mirin nêzîk dibit, pêtvî gupalî dibit, 32 didan jî kit û mat dimînin)
- Yek serî, yek pênc, du tij e, yek val e.
(* xweda, nimêj, bihuşt û dojeh, cîhan)
- Qazî bi qîzê va, mella bi jinê va, çar sêv bi darê va, her yek yekê jê dike, yek dimîne pêva. (* Qîza qazî jina mela ye.)
- Bi hîmeta Birahîm Xelîl, çar dergin, 24 kilîl.
(* Dewar, nal, bizmar)
- Çar çeq çeqîn dikin, du belbelîn dikin, hizar û yek bawewşîn dikin. (* Dewar+2guh+kurî)
- Kepir çerim, pêpelîsk asin. (* zînê hesp û rikêb)
- 4 pê li erdî, 2 li teniştê, qun li bin kuriyê, kîr li sere piştê.
(* mirovek siyarî hesp)
- Deh piye, du destiye, sê seriye, êk periye. (* gulik, çêl, bêrî)
- Deh dar û du ben, hemî bi fiil û fend, nêrçîrê dikin.
(* Deh darêt sûtê pêkdiînin û du ben)
- Bizna bi sih û du şaxa. (* 2 şaxên biznê û siha/sîber wê)
- Ne çandî li ser pişta ne zay, ne zay li ser pişta bê ruhî, bê ruh li ser pişta bê îmanî. (* hêstir/dewar, pir, av)
- rêzka daniya li serê xaniya, sê li sihê, du li tavê. (* nivêj)

<u>Heyva remezanê</u>
- 30 mêvan hatine gundê me, her mirovekî 30 bo çun.
- 30 siyarên li dinê, her bajar 30 diçinê, her gund 30 diçinê, her malê 30 diçinê.

Demên salê

- Sê sênîkên savarê, du disar in, êk germ e.
- Sê bih in, sê zerde bih in, sê hinar in, sê jehremar in.
- Çar bira ne bi qasî hev, derbas dibin li dû hev, yek germ e, yek sar e, di yekê de Adar e, di ya din de mijdar e.

Rojî yên Remezanê

- 30 Qaz in, 50 Beraz in, 3 Tiktike ne, 10 Reşwêle ne. (30 rojî, 50 reman, 3 rojka fela, 10 dehkêt eyda haciyane) * Dibit 40 roj reman û 3 rojiyên êzidiya bin.
- Barê gondura 30 bûn, her êkî 30 giheştinê.
- Yekit lêdekem, yekit le bin zikî ra dekem, yekit le bin kilkî ra dekem, dut pêwe dekem, dut lêwe dekem, duy dit be ser quzî da şûrr dekemewe, be hişkî têtdenêm, be terrî derîdênmewe. (* yek zîn, teng, palî, rikêb, rêşme û descele, kulingey paşkuy zîn, ligav)
- Yekî edem le ber birri, yekî edem le ber tirrî, duwanî pêda şûrr dekem, be wuşkî pêdadekem, be terrî derîdekem. (* bersînge, paru, awzeng, lixaw)

***Minakek ji folklorê Elmanî:***

Ziweibein saß auf Dreibein und aß ein Bein, da nahm Vierbein Zweibein ein Bein, da nahm Zweibein Dreibein und schmiß Vierbein, saß Vierbein ein Bein fallen ließ. (29)
(* Mensch/mirov, Dristuhl/sêpê, Knuchen/hestî, Hund/se)

***B. Bîrkariya xomalî ⁄xweser:***

Çend pirsên hijmariyên narmal in, bersiv bi hijmar tê dan. Ev beş e ne metelok in lê min bi pêtvî zanî li vir çapbikim, ev reng e bîrkariye pêtvîne bo pêzanîn û bîrtîjkirna zaroka.
- 9 tenûrên neh nan, her nanekê 9 kutilk li ser, her kutilkekê 9 pişîk li ser, her pişîkekê 9 têjik li ber. Hijmara

---

[29] . Das große Buch der Kinderreime. 2004 Germany.

têjka çendin? (* 9 tenûr, 81 nan, 729 kutilk, 6561 pişîk, 59049 têjik)

- Refeka çûçka di firin. Çûçkeka dî li ser darê gutê: Hûn çend çûçk in? Êkê bersiva wê da û gutê: Em û hindî me, nîveka me û çarêka me ligel te dê bîne sed. Erê hemî çend çûçkin?
  Hawkêşa cebriye: Me girtî jimara refa çûçka (S) e.
  Loma: S+S+0.5S+0.25S+1=100, 2.75S+1=100, 2.75S=100-1=99
  S=99/2.75= 36 (* Jimara wan teva (36) çûçikin.)

- Refeka teyra gute refeka teyrên dî: Heke êk ji we bête nav me, em dê sê car hindî we lêhêyin. Refa dî gutê: Na! Heke êk ji we bête nav me em dê hindî êk lêhêyin. Erê jimara her refekê çend bûn?
  Bersiv: (* 3, 5)

- Bi pêstirê serkeftime ser kela Hewlêrê. Min pêpkên wê du du hijmartin êk di ma, sê sê hijmartin êk di ma, çar çar hijmartin êk di ma, pênc pênc hijmartin êk di ma, şeş şeş hijmartin her êk di ma.hijmara pêpka çendin?
  Bersiv: (* 61, 121)

- Xirarekê gûza du du danêy êk dimînit. Sê sê danêy du dimînin. Çar çar danêy sê dimînin. Pênc pênc danêy çar dimînin, Şêş şeş danêy pênc dimînin. Heft heft danêy şeş dimînin. Heşt heşt danêy heft dimînin. Neh neh danêy heşt dimînin. Deh deh danêy neh dimînin. Erê xirarî çend gûz tê da ne? Bersiv: (* 2519 gûz)

- Du pîre jina her êkê selkeka/sebete hêka hebû. Heke pîrejina êkê du hêka bidete pîrejina dî dê hêkên wan wekhbin. Heke pîrejina du yê du hêka bidete ya êkê dê hêkên pirejina êkê bine du hindî ya du yê. Bersiv: (* 10, 14)

- Jinekê hêk di firoştin. Zelamekî nîveka hêka û nîv hêk jê

kirîn. Zelamêkê dî nîva hêkên may û nîv jê kirîn. Zelamê sê nîva hêkên may û nîv jê kirîn bêy çi bimînin. Erê çend hêk wê jinê hebûn? Bersiv: 7/2=3.5, 3.5-0.5=3, 3/2=1.5, 1.5-0.5=1, ½=0.5, 0.5-0.5=0 (* 7 hêk hebûn.)

- Sê kes çune xaringehê xarnê bixûn. Paştî xarê viyan parê xarnê bidin. Yê êkê gute xwediyê xaringehê çendê bideme te ? Xodanê xaringehê gutê: Parên/dexlê min çend têdane tu jî hindê bike tê da û heşt derhema jê rake. Her heman axiftin jî gute yê duyê û sêyê. Domahiyê lênêrî ku çi pare bo nemane? Erê parê wî bi xwe/dexil çend bû? Bersiv: 7+7-8=6, 6+6-8=4, 4+4-8=0 (* 7 derhem bûn)

- Nesaxekî sêvek dixwest. Li baxekî sêv difiroştin, lê di heft dergiha ra bac/gomrik werdigirtin. Li her dergihekî nîva sêva bac distendin, divê çend sêva ji baxvanî bikrin heta sêvekê bigehînine nesaxî ? Bersiv: (* 128 sêv)

- Sê bira sê celebên pezî hebûn. Hineka êk berx, hineka du berx û hineka sê berx li ber bûn. Wan pezên xwe li xwe parve kirin, her êkî deh pez û bîst berx gihanê bi mercekî çi berx ji diya xwe neqe. Erê wan çend pezê êk berxî, du berxî û sê berxî hebûn ?
Bersiv: (* 3x (3 pezê êk berxî, 4 pezê du berxî, 3 pezê sê berxî)

- Sed Dînar te yên heyn bû kirîna sed pezî (mih, beran, berx). Her beranek bi 5 Dinaraye, her mihek bi Dînarekêye û her berxek bi Derhemekiye. Erê çawa dê kirî ku parê te têra te bikit û çi ji ber zêde û kêm nebinn û ji hemî toxma bikirî ?
Bersiv: (* 19 beran/95 Dînar, 1 mih/ 1 Dînar, 8 berx/ 4 Dînar)

- Bi sed Dînara divê sed dewara (hesp, hêstir û ker) bikirî, bi mercekî her hespek bi 4 Dînaraye, her hêstirek bi nîv Dînarêye û her kerek bi çareka Dînarêye.

Bersiv: (* 15 hesp/60 Dînar, 75 hêstir/37.5 Dînar, 10 ker/ 2.5 Dînar)

- Êkî du sêv dane du kurr û du baba her êkî sêvek gehiştê ?
  Bersiv: (* kurr, bab û bapîr)

- Aşvan bi xwe û jina xwe ra, karwanî bi xwe û xweşka xwe ra. Sê hinar danê her êkê/î hinrek giheştê.
  Bersiv: (* Jina aşvanî xûşka karwançî ye.)

- Sê candara bi hevra sê ser, şeş çav û du ling hene.
  Bersiv: (* masî, mar, kew)

- Mela û jina xwe, qeşe û jina xwe, mamosta û jina xwe divên li rûbarî bi gemiyê ku bê xwediye û tenê du kesan digire derbaz bibin. Vana teva bawerî bi hevdu nîne û dilxirabin. Gelo çawa ev hemû bê alozî dê derbaz bibin?
  Bersiv: (* Her sê jin bi du caran derbaz dibin. Jina Mamostay vedigere û gemiyê di înit. Qeşe û mela bi gemiyê derbaz dibin. Mala û jina melay vedigerne ve. Mela û mamosta jinên xwe dihêlin û derbaz dibin. Jina qeşey bi du caran herdu jinên dî derbaz dikit.)

- Mirovekî gurek, mihek û cihalekê cihî hebû, dixwest li rûbarî derbaz bibit, gemiyek hebû xwedî û tiştek ji wan bi tinê digirt.Gelo ew zelam dê çawa xwe û tiştên xwe derbaz kit bêy ku hevdu bixûn?
  Bersiv: (* Zelam bo cara êkê dê mihê derbaz ket, gurg û cih li wir dihêlit. Paşî vedigere gurgî dibe û mihê li gel xwe vedigerîne ve. Vê carê mihê li wêrê dihêlit cihî dibe li gel xwe. Cara dawî vedigere mihê jî bi xwe ra dibe. Bi vî rengî hemuyan derbaz dikit.)

- Sih kes di gemiyekê da bûn, di niva deryayê da diçûn. Ji wana 15 Mosilman bûn yên dî Bitperist bûn. Gemî kun dibit, çare divêt 15 kes jê dakevin da gemî niqum nebit. Wesa rêk keftin ku xwe rêz ken û her carê heşt kesa bijmêrin yê nehê derxînin.

Wisa hatine rêz kirin ku her 15 Bitperist havêtine avê û her 15 Mosilman a xwe rizgarkirin û bi silametî gihan rexê avê. Erê vana çawa xwe qurtalkirin?

Bersiv: (* X=Mosilman, += Bitperist Rêzkirna wan bi vî rengî bû.
XXXX +++++ XX + XXX + X ++ XX +++ X ++ XX +)

- Sê kes bi pirê da çûn. Êkî pir dit û pê li pirê na û bûrî, ya dî pir dît û pê li pirê ne na û bûrî, ya sê ne pir dît, ne pê lêna û bûrî. Ev çawa çê dibe?

Bersiv: (* Jineke zarokel li milî ye û êk di zikî da ye.)

- Ji keçekê pirsîn: Diya te kîve çûye? Wê bersiv da: Ya çûy dostî bikete dojmin, êkî bikete du, dê hêteve du ya dê kete êk.

Bersiv: (* çûbû ji dostekî qera bikit, pîrkiyê bû jineka bi hal bikit, dema vegerê wê lihêfeka du tûx/qat çêkit.)

- Hem xesî ye, hem bûk e.

Bersiv: Jinekê xesiya hey û ew bi xwe jî xesiye.

- Li mam heye li xal tune, li mal heye li bal tune.

Bersiv: (* Pîta (m)e ye.)

- Şêstu du ker li serê milekê kirne der, şeş guh û sê ser.

Bersiv: (* Şêstu navê mirovekî ye li gel du kerên xwe.)


***C. Lîztin bi zilkên şixartê:***

Ev beşe jî nakeve di xana meteloka da, lê ji ber ku girêdan heye bi bîrkariyê ve, min bi fer zanî li vir belavkim.
Zorok çend darkên şixatê diînin û bi wan darka dilîztin. Gelek cara çend darka bihevra çarguşa, sêguşa an lakêşa pêkdiînin, paşî destkariyê di hijmar û cihê darka da dikin, dibe cara bi rengê guşey/kujî jî bilîzin û bigurin. (30)


[30] . Sinêle û mezina li gunda yarî bi berka jî dikirin mîna: ``Damanê,

Ji bo pirtir zelalkirnê dixazim du mînaka bînim: (31)


- Ger li wênê li xarê binêrî, 6 çarguşe ji 17 darkên/zilkên şixartê avakirne. Tu yê azadî 5 darka ji vana rakey û ji yên mayn (15 darka) sê çarguşa avakey?




Bersiv: →



- Ger li wênê li xarê binêrî, dê bînî ku 4 çarguşe ji 12 darikên şixartê avakirne. Ji van darka sê çarguşa avake!



Bersiv: →



---

rêzkirna sêyanî ya berka... cara jî şetrenc dikirin.

31 . Mifa ji vî jêderî hate wergirtin: ``Lustige Rätsel-Michaela Cork-Hamburg- sala 2000.``

## *Metelokên xizmanê*

Ev meteloke girêday têkelî û peywendiyên malbatî ne. Gelek zarok bêy bersiva van meteloka bizanin, êkser bersiv didin, dibe ev bersive axaftinên pîs bin û neguncin li gel meteloka, zarokên dî sixirka/hetka wî/wê dibin û pê dikenin.

- Bi şelê te, bi şerwalê te, xizmê xalê te, bête mala te, dê çi deyê? (* Bab e)
  (* Hinek axaftinên pîs dibêjine xwe bêy pê bizanin. Hetka wan diçît)
- Mêrdî bûkî nenkit, hate malit, çî edeytê? (* bawik/bab)
- Take xûşkî xalt e, pûrrîşit niye? (* dayik)
- Kurî bawkt e, kurî daykt e, biraşit niye? (* xot/tu bi xwe)
- Şîrînok li darînok, darînok li gobelok, gobelo birê ket, dunigo pê ket? (* doşav, pale, hêstir)
- Du jin a digotine du mêr a: Hern kurên me, werin mêrên me, babên hingo xezwîrên me.
  (* Du mêra jin bi jinî bi daykên wan kirbû.)
- Wer ist das: Ein Kind meiner Eltern, aber weder mein Bruder noch mein Schwester.
  (* Spasvogel/teyrê heneka) (32)
- Zwei Väter und zwei Sohne schossen drei Hasen schöne; ein jeder hat einen ganzen gesteckt in seinen Ranzen. Wie ist das zu erklären?
  (* Großvater, Vater und Enkel/bapîr, bab û nevî)

---

[32] . Rätzel-Rally-Marliese Wehner- 1993 –Würzburg.

## *Metelokên rewanbêjiyê*

Ev beşe girêday rewanbêjiya peyv û hevoka ne, peyvên wek hev lê bi mana ji hev cuda bi rengekê can/xweşik didene ber hevdu şêlubêlê dixene têda ji bo mirov pê nezane.

- Ka noka ne, ka noka ne, çiyê nezane hêwan e.
  (* Ka noka ye)
- Pirr tan e, pirr tan e, çiyê nezanit hêwan e.
  (*Pira ji tanî avakirî).
- Çîxar û gû se. (* Çîxar : Nav e)
- Ka çu ma dan. (* Ka û dan)
- Ka çû ma nok. (* ka û nok)
- Keru dirêjke. (* Kerû !! eve dirêjkê kalka çêkirnêye)
- Tiştekê mino tiştok e, yê bi kolav û dersok e, navê wî zirçepok e, kure nebe bêj noke. (* Nok e)
- Tiştekê min heye, mîza. (* Mîh za)
- Tiştekê min heye, heqaska? (* Heqas ka?)
- Pêçû maşîn. (* pê çû, ma şûn)
- Mozterulîçe. (* moz, ter î lîçe)
- Giwêt heredune. (* giwêt her ew du ne.)
- Kilkî barîk xoy esture, kere tendûre. (* tendûr/ tenûr)
- Sê pil pan e teng e teng e teng e. (* teng)
- Serî tesk e binî bilaw e, gêj e kilaw e, bêje kilaw e.
  (* kilaw/kulav)
- Xoşkeketan jinî kamtane. (* ketan navê jinekê ye)
- Coma kaçû. (* cu ma ka çû)
- Bereleben. (* berr le ben)
- Xoşe mûşe. (* xoş e û mûş e)
- Serî tîj e binî kun e, gêj e bizane şûjin e. (* şûjin)
- Deskî dar e, serî bizmar e, spiye û dirêj e, ker e dirêş e.
  (* dirêşe)
- Derî dar e, nawî qurr e, ker e famke xiştbirr e.
  (* xiştbirr/qalib)
- Ker sê, bar sê, mer sê. (* Ker, bar, mirov)

## *Metelokên sirtkirna ezmanî (logopädie)*

Eve beşe nakeve di xana meteloka da, çimkî pirs û bersiv têda nînin. Ev hevok e ji peyv û fonitîkê nêzî hev pêktên, gotina wan pirr giringe bo testkirna sirtî û rewaniya ezimanê zaroka.
Ev hevok e gelek cara li demê metelokanê da dihên gotin û bikaranîn lew min bi fer zanî wan jî li vir çapbikim (33)

- Pişk û mişkên li ser derxûnkî, min pişk xar û min mişk hêla. pishk û mishk li derxwin kê, pishk dixum mishk naxum.
- Du selka, êk tû tê, êk gû tê, min ya tû tê xar û ya gû tê havêt.
- Li dur çêl û çal ê werhatim, ketim çalê.
  Li dur îstir û hêstirê werhat im ketim îstirê.
- Miqdisî hatû ji nav rezî, ser û rihên qurmizî, 120 car Muqdisî, heyla gidî Muqdisî.
- Xalê mino, qupal simo, 7 kon konu di gupalê xalê minu.
- Heft dav dezî, heft qormizî, di kona derzîka dayka min ra bezî.
- Sed werzî, dused derzî, di kona derziya diya min ra helbezî.
- Gupalkê babê minê kone, heft gupalik di kona gupalkê babê min ra çune.
- Termê Nihê, babê Nihê, Nihle piştê, çiyê heft car bêjit, dê çit beheştê.
- Rûvî di bin riha rûlê ra lûrî.
- Tîrek reşa kujî sor, ker çi? Cil çi? Cihur.
- Şelê Sêvoy şeş gez in, şeş gez şelê Sêvoy ne.

---

[33] . Min bi fer zanî gelek hevoka bi zaravê Soranî jî pêra belavkem ji ber giringiya mijarê.

- Qir û pir û kavir, li ser berê spiyê girê girovir, li binê gera barholê da.
- Heşt heşt hirç, ew her heşt herçên pişt pirç.
- Sê ker sê cil sê cihor, ne ker ne cil ne cihor.
- Ez çûm bin kûnê mama, min qîr bi kûnê mama rada, mama qir bi kûnê me rada.
- li ser pencê qirrek bû, min til da pin da wê, wê pin da tila min.
- Ez cûm rûviyek yê ji wê ve dihêt, min tila xwe di kurya wî aland, wî kir qîj. wî kurya xwe di tila min aland wî kir qîj.
- Sê selik di ber avê da dihên. Ek tû tê, êk gû tê, êk mû tê. Bi devî cû m ya tû tê , bi destî cûm ya mû tê, bi pî cûm ya gû tê.
- Cêrkê rûnî li bin riha rûlê, kîşk rûlê? ew rûla rex ala rê.
- Şê seyê Şeru hene, her sê seyên Şeru şerrkirin, şer ji şerrê seyên Şeru xweştir nebû.
- Ew reşmal e şeş text e reşmal e, terr şeş text e reşmal e.
- Pîrejiney gu zerd, gu zerd im be demit, demit be gu zerd im.
- Cencerî hem e, xencerî cîre cîryetî.
- Çil çeng tu çeltuk, çuwe kin çil çeng tu çeltuk, gutî: Eto çi çil çeng çeltukî? Gutî: Emin çil çeng tu çeltuk im, edî tu çi çil çeng tu çeltukî?
- Çûme çemî çeqan, çeqel çeltukî çeqand.
- Çûme ser kêlî qebrî qemer e lor, palim da be kêlî qebrî qemer e lorr, aferîn qemer e lorr bo xot û kêlî qebrit qemer e lorr.
- Çûme malî reşey resmîşaxey, gutime jinî reşey reşmîşaxey, bimdê rêşme reşî espe reşî reşmîşaxey.
- Çûme çemekî çar sing im birrîn be carekî, dum kuta kayê, dum daye dayê.
- Çûme çûmekî  be nîsk, lêy bû nêriyekî be tîsk, tîskim girt û helîhatmê, tîsk im berda û helîhatimê.

- Çûme dûlekî be pûş, tê da bû espêkî tûş, emin weşandim esp tûşandî.
- Çûme çûmekî terr, tê da bû gayekî lerr, yek şil e lerr, yek qul e lerr, ewan deyduwand şil e lerr, emin demxuwand singî terr.
- Xurî em ber terr e, le xurîkam merr e lerr birrawetewe.
- Rêwiyekî reqî rinyaw e, le lêwî lêr û lêr e warekî, rêwî lo lêrî delûrî, lêrr lo rêwî delûrî.
- Sed derzî du sed derzî, be kunî derzî dayk im da bezî.
- Sirk e sûrî betatî, xarim dayê be satî, sirkem xuward sil becêma.
- Sê sebete be awê da hatin, yek gû, yek mû, yek tû, le gûy bezîm, le mûy bezîm, tûy degezim, qepim da le gû, çingim da le mû, leqim da le tû.
- Şaxu gir û gundûr, têrr sipiya kujî sûr, yêx ker, yêx cil, yêx cilhûr.
- Şeş teşt miz-aş, mişt miz-aş.
- Şeş mirîşk im hene, sêy sipî popît e reş, sêy reşî popît e sipî.
- Şeş sûşe li sere şeş serşûka şûştin.
- Şil e sawar, sê şil e sawar.
- Şiwanî merr e lerr lewerrên, ew merr e lerr e le roxî rê û le lêrrî melewerrêne.
- Qal e qît e. Qeytanî qaçî qirtand.
- Qet qel le kelî qeşqey kewî nabê.
- Qela kew qirrkirin.
- Qel e reşey ser gumetî, hur hur kilkî dekutî, pilim be pitit, piti be pilim.
- Qel e reşa reş rîhanî, tila min di pinda te, pinda te di tila min.
- Qel e paçkey sere mêwî, car car kilkî debizwênî, xişip kilk im be qingî, xişip qinkî be kilk im.
- Qurrî korê kerî qirr kir.
- Qulî kurek hebû, kurê qulî kewek hebû, çi kew ji kewê

kurê qulî xurt tir nebû.
- Kawe le kargey koka kolay kerkuk kirêkar e.
- Kele kotkî aşê Susê, be şewî sêşem desûtê.
- Kujiyê tîrka dayê sor û zer e.
- Kûna mamê min qîrr pêve, qîr bi kûna mamê min ve.
- Gakey kakem, kakey gakey xuward.
- Geyiştime nêriyekî pirçîn pirçin, her pirçim girt û helîhatimê, her pirçim berda û helîhatimê.
- Geyiştme tajiyekî rîxin rîxin, her rîx im bird le bo demî, her demî hêna lo rîxê.
- Çûçik û kûçuk di gomê de, min çûçik xwar ma kûçik.
- Sêv tilor bû sil tilûr min sêv xwar ma sil.
- Şiva sofî sîso şiş in.
- Yek hebî, yek nebî, vir ji virkira meztir.

**<u>Çend minak ji folklorê Elmana</u>**:
- Fischers Fritz fischt frische Fische, frische Fische fischt Fischers Fritz. (* Fiscers Fritz masiyên taze digirit, masiyaên taze dihen girtin bi Fischers Fritz.)
- Bierbrauer Brauer braut brauen Bier.
- In Ulm, um Ulm und um Ulm herum.
- Zehn Ziegen zogen zwei Zentner Zucker zum Zoo.
- Zwischen zwei Zwetschenzweigen zwitschern zwei Schwalben.
- Der Kottbusser Postkutscher putzt den Kottbusser Postkutschkasten. (34)

**<u>Çend mînak bi zimanê Erebî</u>**: ([35])

* و قبر حرب بمكان قفر .... و ليس قرب قبر حرب قبر.
* لنا بقرة و لبقرتنا رقبة و لرقبة بقرتنا رقة و رقة رقبة بقرتنا ارق من رقة رقبة بقرتكم.
* ركب امه شال ابوه، شرب ميت ببطن حي، اكل حلال ببطن حرام.
* خالى رجل امى.  (خالى رجل ما متعلم)

---

[34]. Das große Buch der Kinderreime. 2004 Germany-bp59.
[35] . Berkotêkî metelî folklorî Kurdî-Sedredîn Noredîn- Hewlêr/2005.

## Metelokên nû afrandî

Di van çend salên dawî da, mirov dibînit ku çend nivîsevana destdaye afrandin û nivîsîna meteloka. Bi hizra min ev e bizaveka pêtvî û pîroz e, nûkirin di metelokê da divê bihê kirin û zarokên me jê bê parnebin.

Metelokên nû tên afrandin divê bi seng, selîqe, qafiye, lêkînay, sade û pirr wate/meina bin. Hinek nivîsevana pûte pê daye, bi rengekê ciwan û hejî nivêsayne û afrandin têda kirîne.
Li vir ez wek mînak/nimone çend metelokên nû çêkirî/afrandî bercavkim.

**1. Mihemed Emîn Doskî**/Duhok



- Tiştîkê min çar reng e, gelek bi nav û deng e
  Li çar parcên welatî, bo wê xebat û ceng e
  Kesk û spî sûr li ber, rojeka zer ketî ser
  Li hembêza esmanî, yê bilinde her û her
  Sûr e nîşana xûn e, kesk e ya xêr û jînê
  Spî jî yê aştiyê ye, roj ya hizir û zanînê
  Keskusûr e yan tav e, alaye yan gulav e. (* Ala) (36)

- Tiştîkê min û te ye, li ber destê hemiya heye
  Di avê da dih`elit, saloxet jê ev e ye
  Çi car xo nahebînit, bihay bo xo nabînit
  Ji bo mifayê xelkê, herdem xo dih`elînit
  Yê giring û erzane, bo paqijya hemya ne
  Kesê bikar neînit, ew a`şiqê derda ne
  Ew guşt e an sabûn e, savar e yan teh`în e. (* sabûn) (37)

---

36 . Govara kepir hijmara 38/Duhok, bp19.
37 . Heman jêder, hijmara 35/Duhok, bp19.

- Tiştîkê min e tişt e, ne wî ber e ne pişt e
  Bi desta nahêt girtin, dunya hemî jê mişt e
  Roj hebit naderkevit, çiray hilkey dê revt
  Gelek yê şehrezaye, bi gişt cîhan dikevt
  Zaroka qet nevên ew, ji wan ve dê ketin hew
  Lê bi rastî we nîne, dema bêtin xoş e xew
  Ew nîsk e yan kuncî ye, sih e yan jî tarî ye. (* Tarî) (38)

**2. Ebdurehîmê Muşê**/Elmanya
- Kalê pîr li civata Mîr. (* Semawer)
  Du golê reş û hişîn, li ser bejna şan û şîn. (* Çav)
- Darê hişkê gûz, dertîne dengê bi bandor û zîz. (* Bilûr)
- Duheb sêvê gilover, li ser sîngê sor û zer. (* Memik)
- Cotekî marê reş, jorda, xwe berdan geliyê xweş. (* Gulî)
- Bê serî û bê linge, di herike li bajar û gund e. (* Çem)
- Koşka tarî û bi mar, bi dûpişk û cinawar ! (* Gor, Goristan)
- Mîr hilgirtiye dirî, zehf kalekî hilhilî, jê naçe çerm û dirî. (* Şijo)
- Şûva reşi ew dimeşi, dil û cîger pê di geşi. (* Tirên)
- Min hem zar e, him jî ziman, ez mam wek hêsîrên zeman, na axive dev û ziman, pêdivî tev bi hêsiran, dimirim ji derd û keseran. (* Dergûş)


**3. Ferqîn Melek Aykoç**
- Pirr pelên sîs, navê wê lê nivîs, ji bo pênivîs, dikeve kîs. (* Defter)
- Lastîkek nerm e, radike çivê qelem e. (* Jêber/Lastîk)
- Ne bi hest û gêjî, bi pîvan û mêjî, qelem a radihêjî, ji bo rastbe dirêjî. (* Rastkêş/Mestere)
- Wekî şivan ê berxika, dinêre li zaroka, fêrdike hêdîka, zanîn û tiştika. (* Mamosta)
- Awayê max û holê, zaran re wek malê, kursî û mase li

[38] . Heman jêder, hijmara 36/Duhok, bp27.

balê, cihê fêrbûna salê. (* pol/sef)
- Li dibistan e, hîn ciwan e, li bendan e, divê bizane, dew û dozan e. (şagird/qutabî)
- Li dîwar e, ne kewar e, qor bi qor e, wekî per e, tişt li sere, ki nizane ew ker e. (* tereq)

**5. Mahir Berwarî**

- Beg û megê têkbestî, her yêb êş û nalîn e
  Mîrê qeda lê şkestî, dest û pê lê dibestîne
  Jiyê wî digihe sedî, ji serv e û bin ve hestîn e
  Şikil kodê leşkirî, xwe li ber ava dixişîne
  Wekî mar e bi serî, Yê bê bela û miskîn e



- Xişt û miştê-l hişkan e, dûv dirêjê sîng pan e
  Lawu to pê bizane, yê bê soz û jivan e
  Hema derket ji konê, xencer jehra li hewa ne
  Gih gih korî serê tîj, karê wî pêvedan e



- Bi çîqu çîqal û çeng e, her yê bi şer û ceng e
  Dest û pê wek silinga, ne yê zift û çeleng e
  Ne yê bi jehr e wek stinga, yê bi heşt piyaw du çeng e
  Hêke di nîva hinava, rengê wî rengê jeng e
  Şerkerekê pirr sava, yê feqîr û bê deng e
  Dijît li dêm û ava, ne ew beqe û nehing e



## Çend metelok bi zaravê Soranî (39)

Wekî min li serî amaje pêkirî, bi hizara metelokên Kurdî bi zaravê Soranî didestê min da ne, lê li vir delîve nîne ku hemiya belavkim. Min bi fer zanî cend meteloka wek mînak li vir çapbikim da zarok û xandevanên kurmanc hay jê hebin, mifa jê wergirin û ev pirtûk e pê zengîn bibe.

- Jûrêkman heye tarîk tarîk, pirr e le zeng e qilîşey barîk.
  (* Dem ûdidan)
  Em lay kelek ew lay kelek, nawerastekey burcî belek.
  Em lay dîwar ew lay dîwar, nawerastekey segêkî har.
- Darebenê le qed kenê, şêx û mela dest edenê. (* lût/difin)
- Gloley baz, day le hewraz. (* Çaw/çav)
- Serî be xot, binî be daykit. (* Memik)
- Ser banêk e bin banêk e, 4 merr û şiwanêk e.
  (* Nav û pişt dest û pence/til)
- Kerî mirdî, barî zîndî. (*M û lanik)
- Le serewe yek, le binewe du, be qinkî baw bapîrta çû.
  (* Derpê)
- Reşî reşendû, deçête kunêkî be mû, dête derê aw le dû.
  (* Kilçûk û çaw/kilçîv û çav)
- Gareşî mam Wesman, dengî degate asman. (* Tifeng)
  Şew tarîk e, rim barîk e, xom nawêr im, tu denêrim.
- Hêlkey matê, ba nagatê. (* Gule)
- Sêlî zirr zirr, kewte mizir, kolke newî, Bexda rewî. (* Top)
- Her le zemanî pîr û eshabî, kurr gewretire le babî.
  (* Hêstir)
- Reqozey quzî, tamî cêştî. (* Dûngî merr/dûng)
  Serpûşî quzî, derxoney qûnî, nêrî diyare be kîr û gunî.
- Çaw monî kilk bor e, fêlbazî mamir xor e, nirxî pêstekey zor e.(* Rêwî/rûvî)
- Be ser kafir e, be pê mindal e, be tîr û kewan Rostemê Zal e. (* Sîxur)

---

[39] . Berkotêkî metelî folklorî Kurdî-Sedredîn Noredîn- Hewlêr/2005

- Le bin xurî, le ser dirrî, heta dezanî pêwe detirrî. (* Jûjî)
Mamêkim heye le deştê, sê sed tîrî le piştê.
- Eger aqildarî û eqlit le bîre, le teyrekana kamyan be şîre.
(* Şmşemekuwêre/şevrevîn)
- Serî şax e, kilkî kêl e, qingî kêr e, dengî dilêr e, nawî şêr e. (* Keleşêr/dîkil)
- Mil nexşîn e le çiyay zûr e, rengî bûr e qaçî sûr e, dojminî xoytî û xo xor e. (* Kew)
- Le asmanan tebeq tebeq, le ser mîlî kurt û kelek, mandû nebî ebabelek. ( *Leqleq/leglege)
- Serî mar e, piştî kar e, zigî berx e, du kelex e.
(* Peresêlke/meqesok)
- Dêtewe kulkin, dewêtza ne kullkin, beçey beçeza kullkin.
(* Mirîşk û hêk)
- Zerê zeranî, li nav mêzera kitanî, ne li erdî ne le asmanî.
(* zerkahêkê)
Kilawî Hemze palewan, bê têkel û bê derman.
Hêskey kadîn e, çi pêpilkey nîne, mirdî têda jîn e.
Sênî û fexfûrî awî du reng e, be sardî sil e be gerî tung e.
Ne mirîşk e ne barok e, be serî xoy dada spî çarok e.
- Şûtî şetriqî, dam le berdî ne teqî. (* Kîsel/kusî)
Pîrî bin gilî, delêy berd e bin hengilî.
Piştî berd e ber niye, 4 pêy heye ker niye, ka xor e û ker niye.
- Qurr e şînê bê mû, eqîrrênê zû zû. (* Boq/beq)
Merre kerey bin gewerrê, heldeperrê na lewerrê.
Şilî qûlî bê muw e, qirr e qirrî le duwe.
- Asinî sar le kun e dîwar, gît le gît, gît xepî tar. (* Mar)
Kilafey çîn çîn, çîn le ser çînan e, herçî helbênê Rostem Palewan e.
- Klafey kew e, mirxî bê ziman, herkesê helîbênê aferîn cewan. (* Masî)
Bê perr û bal e, eger mird guştî helal e.

## Çend metelok bi zaravê Zazakî (40)

Ev çend metelok e bi zaravê zazakî ketine destê min. Ji bo zarokên delal li vir belav dikim.

- Tiştakî min heye şave bûke bî ru papûka. (* Nîvin)
- Tiştekî min heye ji vir riz, heta Xalabe tîz. (* Mîrî)
- Glûko mü bi havodo. (* Xortim)
- Tiştekî min heye nav mina navî tazi toponî mîna topono xîştiro. (* Tarozi)
- Tiştekî min heye li vir xîşt li arde din quna xwe almoşt. (* Şijing)
- Tiştekî min heye li xanî malé bé ru bé dardaye. (* Pistîk)
- Tiştekî min heye lé ro digare digare, li şev te davi xwe jev dike dadiste. (* Maros)
- Tiştekî min heye bê digare bê şavî xwê qûrin. (* Çuçik)
- Tiştekî min heye li ave dixim naşke, li arde dixim dişke. (* Eq)
- Tiştekî min heye sarî minî mara qunî minî qunî tuccora. (* Şîşe lombo)
- Tiştekî min heye mange sor şak ber jur. (* Maşk)
- Tiştekî min heye buço şîqin di hewşu kin. (* Muj)
- Xangaka min heye serî xwe tiji raşk. (* Ecir)

[40] . Ji malperê www.zincirlikuyu.net hatine wergirtin.
(* Min xast têkeliyê bi nivîsevanekê şareza di zaravê Zazakî da bikim ji bo serastkirna van meteloka. lê kesek bidet min neket.

## Çend metelokên Elmanî (41)

Evên jêrî cend metelokên Elmanî ne, min bi fer zanî di vê pirtûkê da bo zarokên Kurda belavkim, bo hemberkirin û mifa jê wergirtin.

- Was ist nackter als nackt, so nackt, daß es knackt.
  (* Skellet/heykelê mirivî)
- Es gibt ein Vogel, der hat zwei Beine, doch keinen Schnabl und Federn auch keine. (* Vogel/ firinde)
- Man isst es nicht, man trinkt es nicht, unda es schmeckt gut. (* kuß/maç)
- Ich darf mich nicht der Ruhe weihn, muß fließen stets im Kreis. In meinem roten Kleid, darf ich erst stillestehn, wenn sich hat der Tod. (* Blut/xûn)
- Ich kenn` ein warmes Haus, es hat drei Türen für rein und raus.Geht man morgens rein ins Haus, schauen unten Füße raus.Abends geht man wieder raus Sag mir doch: Wîe heißt dies Haus? (* Hose/pentron)
- Zwei Fenster sind es, die man trägt,
  ein jedes sich von selbst bewegt;
  man guckt durch sie nicht in das Haus
  doch guckt man desto mehr hinaus. (* Augen/Çav)
- Es ist ein großer Dom, der hat eine gelbe Blum;
  Wer die gelbe Blum` will haben,
  Muß den ganzen Dom zerschlagen. (* Ei/hêk)
- In der Luft, da fliegt`s. auf der Erde liegst`s
  In der Hand, da schwitzt`s, auf dem Ofen zerläuft`s
  Im wasser ersäuft`s, wer gescheit ist begreift`s.
  (* Schnee/befir)
- Bei Tag kannst du mich nicht sehen
  bei Nacht kannst du nach mir gehen. (* Stern/stêr)

---

41 . Rätzel Rallye-Marliese Wehrner- 1993 Würzburg.

# Zimanê Çizavizî (42)

Ev e zimanekê bi şifre ye, zaroka bo karên nihênî bikardianî, da kesên derdora tênegihin û nezanin ka çi dibêjin?

Pîta `z` dixene nav pîtên dengderên her peyvekê, bi mercekî pîtên pêş û paşê `z` yên bêdeng bin ([43]). Eger pîteka bêdeng nebe divê yekê ya wekî ya pêşiyê lê zêdekin Ew kesên şareza dibin di vî zimanî da, têkdigehin û dikarin digel hevdu biaxivin bêy ku kesên dî têbigihin.

- Bi şevê were mala me.
  Çizavizî: Bizi şezevizê wezereze mazalaza meze.
  Qizavizî:Weqereqe maqalaqa meqe.
  Gizavizî: Wegerege magalaga mege.
- Elî mirovekê lawe!
  Çizavizî: Ezelîzî mizirozovezekêzê lazaweze.
  Gizavizî: Eqelîqî miqiroqoveqereqekêqê laqaweqe.
  Gizavizî: Egeligî migirogovegeregekêgê lagawege.

---

[42] . Di meha 5.2009ê da , di tv zagros da du keçen Hewlêrî ev zimane zindîkir di bernamê ``Ez ciyawazim`` lê li şiwîna Çizaviziyê, Qizavizî û Gizavizî bikarîna.
[43] . Miraz jî pîtên bêdeng evene: î, i, e, , u, uwd

## Werzên salê

Evên li jêr jî ne metelok in, lê daku hinda nebin baştir ewe belavbikim.

- Adarê, meşik li darê, li vêrê ne, li guhûşka Şingalê.
- Şuwatê, befir û batê, kiçkên Helweya ji giya tê.
- Kanûna mezin, befir hat rim bi rim,  wisa çû heçku agirê xodê li bin.
- Kanûna biçûk, befir hat pîçik pîçik, bi erdî ve bû muçînk.
- Xizîran xinzirî, tîrmih êwirî, çi xwe li ber negirit, ji bilî belgê çulî, mêwa tirî, binê şafirrî.
- Tèbaxê tirî kete ser axê.
- Îlunê, bi selik û seviya çunê.
- 18y adarê, hejde bihustên befrê hatine xarê, çi nema heta dangê êvarê.
- Gulan naçit bê gul, xizîran naçit bê mil.
- Tave tîkên nîsanê, sartir in ji zivistanê.

## Jêderên pirtûkê

Bo cara êkê di vê pirtûkê da, min beramberî her metelokekê navê jêder û kesên ji zardev hatî wergirtin nivîsî. Lê min dît ko ne tîştekê pirektîkiye, ji ber ku gelek cara êk metelok ji sê-çar jêdera hatiye wergirtin, lew min wisa baştir dît ku navên wan jêder û berêza bi emanet ve li vir belavkim. Daxaza lêborînê dikim heke min navên hinde berêza ji bîrkirbin xodê wê xêra wan binvîsit.

- Gelek ji van meteloka min bi xwe ji zardevê gundiya komkirine.
- Mamosta Ese`d Elkûşkî/Berwarî/Duhok.
- Mamosta Welîd Ebdulrehman Eredinî/Duhok.
- Reşîd Sindî/Elmanya.
- Endaziyar Behzad Zêbarî/Akrê.
- Haşim Sipîndarî (rihmetî)/Berêgarê/Amêdiyê.
- Mehmud Xidîr Sîdekanî/Elmanya.
- Kerîm/ji rojhelatê Kurdistanê/Elmanya
- Şemal Gulî/ Elmanya.
- Zekî Boselî/ Elmanya.
- Ehmed Çemlîbil /Elmanya.
- Agirî Ararat.
- Farqîn Melek.
- Malpêrên: www.serhed.org, www.dilpak.de, www.mizgin.net, www.rociwan.com, www.tirej.net, www.ufkumuz.net, www.dengemamoste.com, www.zincrlikuyu.net, zazakî, www.serbajar.net û www.members.chello.se/amedtigris. (44)
- Pirtûka ``Tiştonek1- Emîn Akbaş 2006-Elmanya``

[44] . Bo zanîn metelokên ji van malpera hatîne wergirtin nagehne 50 meteloka, her malperekî ji yên dî wergirtîne, metelok dubare û sêbare bûyne.

- Pirtûka ``Berkutêkî metelî folklorî Kurdî-Sedredîn Noredîn–Hewlêr-2005``. Ev pirtûke geleka hêjaye, metelokê soranî û kurmancî ji gelek jêdera wergirtîne û lêkolîneka zanistî û ekadîmî li ser kiriye. Metelokên kurmanciyên wê ji van jêdera wergirtîne:

- Ehmed Zero ``Mamkên Kurdî-bexda-1985``.
- Eh`med Qerenî ``Kanî-Bexda-Bexda-1984``.
- Pêzanê Alîxanî ``Du mirarî ji gencîna folklorê Kurdî-Hawlêr-1985``
- Xalid H`usên ``Dergihek bo folklorê Kurdî-Bexda``.
- Şukur Mistefa (Komele têxtî folklorî Kurdî-Qenatê Kurdo-Bexda``

Jêderên Elmanî:

- Rätzel Rallye-Marliese Wehrner- 1993 Würzburg.
- Das große Buch der Kinderreime. 2004 Germany-bp59.